# SERKEFTINA MEZIN A ŞERVANÊN XEZEBA FIRATÊ



## 45 gund û 20 gundik rizgar kirin

### SERKEFTINA MEZIN

**ŞERVANÊN** Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê piştî ku di baskên Til Semen de bi pêş ketin û baskan xwe gihand hev, herêmeke bi qasî 450 km çargoşe dorpêç kiribû. Şervanan ji bo paqijkirina wan herêman dest bi opersyona rizgarkirinê kir û di encama operasyonê de 45 gund û 20 gundik ji çeteyên faşîst ên DAIŞ'ê hatin rizgarkirin.

### SERWERÎ YA GELAN E

**BI RIZGARKIRINA** 45 gund û 20 gundikên herêmê re, herêma di çarçoveya Xezeba Firatê de ketiye bin kontrola şervanên azadiyê bû 2 hezar û 644 km çargoşe. Operasyona şervanan a ji bo rizgarkirina hemû şêniyên herêmê ji destên DAIŞ'ê didome. Şêniyên herêmên rizgarkirî bi tilîliyan şervanan pêşwazî dikin... *RÛPEL- 5*


ROJEVA
# Medya
15 Çile Yekşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 66


## Gund û şehîdgeh bombe kirin



HPG'ê diyar kir ku artêşa tirk bi balafiran gundên Golika û Seferî yên bi ser Duhokê ve û şehîdgeha gerîlayan a li Herêma Metîna bombebaran kirine. HPG'ê diyar kir ku dê êrîşan bê bersiv nehêlin... R3

# ŞENGAL XWESER E

**Di van rojan de ku dewleta tirk tevî şirîkên xwe yên herêmî gefan li Şengalê dixwe civaka êzidî ya li Şengalê ji bo îlana xweseriyê û parastina wê zend û bend badan**

### ÊZIDÎ ÇARENÛSA XWE DIYAR DIKIN

Meclisa Avakar a Şengalê îşaret pê kir ku di çarçoveya daxwaza gel de ew amadekariya îlana xweseriyê dikin û bang li hêzên navneteweyî jî kir ku hêzên berpirsyar ên fermanê ceza bikin. Meclisê da zanîn ku ew ê êzidî çarenûsa xwe diyar bikin...

### ŞENGALEKE AZAD DIXWAZIN

Ciwanên êzidî jî li dijî her şêwe gef û êrîşên li dijî Şengalê, ji bo ewlekarî û parastina xwe daxwaza şengaleke xweser dikin. Ciwanan diyar kir ku ew Şengaleke bêmetirsî dixwazin û bal kişand ser girîngiya xweparastinê û mezinkirina YBŞ û YJŞ'ê... RÛPEL - 7



## AKP Sûrê bi îşkenceyê lê dike

Her çi qas AKP propagandaya "Sûr bi hezkirinê bilind dibe" bike jî rastî berovajiyê vê yekê ye. Sivîlên di dema qedexeyê de ji Sûrê hatin derxistin rastî heqaret, çêr û îşkenceya polîs û leşkeran hatine...

Medya Rûpel - 3



## PKK garantiya azadiyê ye

Bi sedan ciwanên ku ji bo xwedîderketina li gerîlayan berê xwe da Qendîlê û li wir daxuyanî da çapemeniyê. Ciwanan destnîşan kir ku bi tu awayî êrîşên li ser gerîlayan qebûl nakin û îfade kir ku PKK garantiya jiyana azad e... *RÛPEL - 7*



## Ji bo Ocalan meşa dirêj

Li seranserê Ewropayê kurdistanî ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li qadan bûn. Di salvegera 18'emîn a Komploya Navneteweyî de kurdistanî dê ji Luksemburgê heta Strasbourgê bimeşin û xwedî li Ocalan derkevin... RÛPEL - 7



## Li Çankiriyê greva birçîbûnê

Îşkenceya li zindanan derketiye asteke wisa ku girtî ji bo ku dengê xwe bidin bihîstin dest bi grevên birçîbûnê dikin. Li Çankiriyê girtiyên ji doza PKK'ê duşemê dest bi grevê dikin. Li zindanên Gebze û Bakirkoyê jî îşkence pir zêde ye...

Medya Rûpel - 3



### Di warê yekitiyê de navê herî girîng Ocalan e

Hevberdevka HDK'ê Koçyigit got ku di warê yekitiyê de navê herî girîng ê ku banga yekitiya neteweyî dike Rêberê Gelê Kurd e û divê azad bibe... R- 7



### Jinan ji Til Temirê ji bo kongreya neteweyî bang kir

Jinên ji Til Temirê ji bo lidarxistina kongreya neteweyî bang li partiyên kurd kir û diyar kir ku heke gelê kurd bibe yek tu hêz pê nikarin... R- 2



## Wa fek qoricîtî ra verabidî

Gerîlaya YJA Stare Hîvda Pîrosî ke keyeyêko qoricî ra beşdarê PKKyî bîya, veng da keyeyê xo û heme qoricîyan û wina va: "Eke wijdanê înan bibo, ganî qoricîtî ra fek verabidî û vera birayanê xo de sîleh nêxebetnî." ...

Medya Rûpel - 11

Akademîsyen û nuştox Fîkret Başkaya

## Muxalefetêko ortax ferz o



Akademîsyen û nuştox Fîkret Başkayayî derheqê krîzê ekonomîk û sîyayî yê Tirkîya de vînayîşê xo ard ziwan. Başkayayî dîyar kerd ke Tirkîya kaosêko gird reyde rî bi rî menda û qiseykerdişê xo wina domna: "Labelê Tirkîya ancax bi muxalefetêko ortax yê ke tevgerê sîyasî yê kurd zî tede eşkena nê kaosî rizgar biba û probleman çareser bikera."... R - 11

## Kujer dewlet bi xwe ye

Dayikên Şemiyê û xizmên windayan li Amed, Stenbol û Îzmîrê çalakî li dar xistin û da zanîn ku kujerê zarokên wan dewlet bi xwe ye û dê tim li dew û doza xwe bipirsin... R-3

## Polîsan wêne xistin çenteyê Semrayê

Rojnameger Semra Turan li Çewlikê di serdegirtina malekê de hat binçavkirin. Hat diyarkirin ku polîsan wêneyên PKK'iyan xistine çenteyê wê û ev wêne kirine sedema binçavkirinê. Li aliyê din 6 rojnameger ev 22 roj in bi awayekî kêfî li Stenbolê girtî ne, parêzeran bertek nîşanî dozger da... RÛPEL - 6

www.arsivakurdi.org

## Qeyûm dawî li xebata jinan anî

**MEHMET ŞÎRÎN YAŞAR Ê** ku wek qeyûm tayînî Şaredariya Erdîşê bû, 15 kedkarên şaredariyê ku piraniya wan jin in, ji kar hatin derxistin. Xebatkarên şaredariyê bêyî ku hincet bê nîşandan, hatine derxistin. Hevşaredara Erdîşê Dîba Keskîn bi hinceta "Li herêmên Rêveberiya Cewherî maye" salek û nîv e di girtîgehê de ye. Di 11'ê îlonê de Mehmet Şîrîn Yaşar ji aliyê Wezareta Karên Hundirîn ve wek qeyûm hat tayînkirin. WAN - ŞÛJIN




# Kongreya neteweyî şansekî mezin e

**Jinên bajarê Til Temirê ji bo lidarxistina kongreya neteweyî banga yekbûnê li partiyên kurd kir û diyar kir ku heke gelê kurd bibe yek tu hêz nikarin gelê kurd têk bibin**

Jinên bajarê Til Temir ê Kantona Cizîrê der barê kongreya neteweyî û girîngiya wê ya ji bo gelê kurd de nêrînên xwe anîn ziman. Rêvebera Kongra Star Dilşa Yûnis da zanîn ku gel bi şoreşê re digihîjin armancên xwe û wiha got: "Me gelek serkeftin bi xwîna şehîdan bi dest xistine, ji bo wê divê em bibin yek, doza mafê xwe bikin û rê ji dijminan re venekin. Em bangewaziya biratiyê dikin. Dema ku kurd bibin yek tu hêz nikarin li hemberî wan bisekinin." Dilşa Yunis anî ziman ku serkeftinên şoreşa Rojava bi keda jinan pêk hat û destnîşan kir ku ji ber wê yekê divê ku jin di kongreyê de cih bigirin.



Endama Encûmena Zagonsaz Aystan Xelef jî got ku kongra neteweyî şansek mezin ji bo gelê kurde û wiha axivî: "Yekbûna kurdan serkeftina herî mezin e. Ger ku yekitiya kurdan hebe dê kongre jî bi serkeve. Îro projeya Pergala Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê hatiye îlankirin, gelek kes naxwazin ku ev proje biçe serî. Her wiha li dijî lidarxistina kongra netewîyî jî derdikevin û naxwazin ku biser bikeve. Mînak gotinên Nêçirvan Barzanî ne. Êdî bes e, baweriya tevahî gel bi vê gavê tê divê bi lez pêk bê." Endama Bûroya Têkiliyên Dîplomatîk a Kongra Star Ebla Dawê jî destnîşan kir ku yê azadiya Kurdistanê bixwaze divê şer bike û li ber xwe bide û ev bang kir: "Em bang li hemû gelê kurd dikin ku Kongra Netewî lidarbixin û bi yekitiya xwe Kurdistanê azad bikin. Em ji xwe re xebat dikin, ne ji kesên din re, em dixwazin ku kongra neteweyî bi ser bikeve." *TIL TEMIR - ŞÛJIN*

## Jinên ereb bi dilgermî tev li YPJ'ê dibin



NÛRHAN EBDÊ / REQQA - ANHA

**Serkeftinên ku YPJ'ê li herêmên bakurê Sûriyeyê bi dest xistine, bandoreke mezin li jinên pêkhateyên ereb kir. Bandora berxwedana şervanan li ser wan çêbû û tev li xebatên parastinê bûn. Niha jî bi dehan jin tev li Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê dibin û ji bo rizgarkirina Reqqayê şer dikin.**

**Şervana YPJ'ê Leyla Stêrk diyar kir ku ew di civakeke girtî de mezin bûn, di civaka wan de gelek zilm li ser jinan dihat meşandin, çeteyan zilm derxist asta herî jor û wiha got: "Ji ber wê min rêya çareserkirina vê pirsgirêkê bi tevlîbûna YPJ'ê dît. Ez bi vê gavê bûm xwedî vîn û îradeyeke mezin. Dema ez tev li YPJ'ê bûm, hevalan pir bandor li min kir. Tevlîbûna me ya nava refên YPJ'ê serbilindiyeke mezin ji jinên ereb re ye."**

**Şervana YPJ'ê ya ji pêkhateyên ereb Bêrîtan Cûdî jî got ku ew jî piştî rizgarkirina Mincibê tev li YPJ'ê bûye û wiha axivî: "Ez êdî xwedî îradeyeke xurt û bihêz im. Em di parastina welatê xwe de cih digirin û dê ware xwe rizgar bikin û ava bikin." Her du şervanên ereb bang li pêkhateyên ereb kir ku tev li YPJ'ê bibin.**

## Hevserokatî mîsogeriya wekheviyê ye

Hevserokên Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê der barê girîngî û pergala hevserokatiyê de nirxandin kirin. Jinan diyar kir ku ji bo pêkanîna pergala hevjiyana azad di nava civakê de hevserokatî şert e û got: "Hevserokatî mîsogriya wekheviyê ye." Hevseroka Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê ya bajarê Kerkûkê Rihan Hemdî destnîşan kir ku pêşengiya jinan ji bo xebatê birêxistin û pêşxistina civakê pergala hevserokatiyê girîng e. Rihan Hemdî diyar kir ku divê li Başûr jî wek jinên Rojava bibin mînak ji bo jinên têkoşer û wiha got: " Sakîne Cansiz û bi sedan jinên di serhildanan de li hemberî dijmin li ber xwe daye, hene. Lê belê şoreşa birêz Abdullah Ocalan pergala hevserokatiyê diyarî me jinan kir. Ev pergal destpêkê li Başûr, piştre li Rojava niha jî li Başûr ket meriyetê."

Hevseroka Tevgera Azadiya Herêma Şarezor Xêlan Sadiq jî anî ziman ku ew wek hevserok hewl didin roja jinên azad di nava civakê de bi hêz bikin û destnîşan kir ku pergala hevserokatiyê li hemberî pergala koletiyê, bêadeletiyê û newekheviyê altarnatîf e. Hevseroka Tevgera Azadî ya bajarê Silêmaniyê Ronak Mecîd jî anî ziman ku jinên kurd bi tevlîbûna xwe ya di nava şoreşê de roleke sereke ya pêşengiyê lîstiye û got ku di pergala hevserokatiyê de jin bi vîna xwe biryaran didin. *SILÊMANÎ - ŞÛJIN*



## Govend û stran tirsê çêdikin!

Li girtîgeha Jinan a Bakirkoyê ya Stenbolê bi OHAL'ê re binpêkirinên mafan ên giran pêk tên. Girtiyên siyasî nameyek nivîsî. Girtiyên siyasî diyar kir ku binpêkirinên ku pêk tên ji rewşa 12'ê Îlonê derbas bûne û wiha hat gotin: "Em girtiyên siyasî yên PKK û PAJK'ê yên girtîgeha Bakirkoyê piştî hewldana darbeya 15'ê tîrmehê bi OHAL'ê re em bi pêkanîn û zextên giran re rû bi rû ne. Îdareya girtîgehê pêkanînên ku ji 12'ê îlonê derbas bûne roj bi roj bi awayekî girankirî dimeşîne. Em li dijî van pirsgirêkan banga hestiyariyê li hemû raya giştî dikin. Bila girtîgeh nebin cihên nû yên komkujiyan."




***Girtiyên jin ên ji doza PKK û PAJK'ê binpêkirinên ku pêk tên wiha rêz kirin;***

✓ Dayika Aştiyê ya 62 salî ku nû hatiye girtin, di têketina girtîgehê de rastî lêgerîna tazî hatiye.

✓ Piştî ku hejmara girtinan zêde bûye, îdareyê li blokên ji hev dûr koxuşên nû vekirine û girtî li wan deran bi cih kirine, rojên telefonê cuda kirine û bi vî awayî têkiliya koxuşan ji hev qut kiriye.

✓ Ji ber ku girtiyan li koxuşên xwe stran gotine, govend gerandine û dirûşm berz kirine, bi hinceta 'li girtîgehê tirs û xofê diafirîne' ji ziyareta girtî û vekirî bê par hatine hiştin.

✓ Di demên dawîn de pêkanîna derbaskirina pergala jimartina leşkerî ya 12'ê îlonê tê ferzkirin.

✓ Li beşa xwarinê li ser lingan jimartin tê ferzkirin. Ji ber ku me ev qebûl nekir bi îdiaya 'nehiştine jimartin bê kirin' der barê me de her roj girtek tên girtin û lêpirsîn tên vekirin.

✓ Ji sûcên 'li dijî jimartinê derketin' û 'propaganda û perwerdeya rêxistinê' cezayên hevdîtinê û hucreyê tên dayîn. Ji ber ku înfaza hinek hevalên me şewitiye, qedexeyên du sê salan hatine danîn.

✓ Ferzkirina jimartinê hatiye asteke wisa ku hevala me Felek Gun dema nimêj dikir gotine 'serê xwe veke, rûyê xwe nîşan bide' û nimêj xera kiriye.

✓ Di navbera koxuşan de çûne guhertine û alav birine xwarê û di cîhaza X-Rayê re tên derbaskirin. Kêrên fêkiyê, tix, bazinên rengîn rastî cezayê hucreyê tên. *STENBOL*

## Bi HSD'ê re hêviyên jinên reqqayî zêde dibin

ERDOGAN ALTAN / REQQA - DÎHABER

Di pêngava duyemîn a operasyona Reqqayê de, Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD), bi sedan jin ji çeteyan rizgar kirin. Jinên ku behsa çewisandin û pêkutiyên DAIŞ'ê kirin diyar kir ku xemgînî û tirsa wan, bi hatina HSD'ê re vegeriya ken û hêviya jiyanê. Ji niştecihên gundê Hemreyê yê di çarçoveya operasyonê de hat rizgarkirin, dayika 2 zarokan Fatînma Abdullah dema behsa xelasbûyîna ji zilma DAIŞ'ê dike hêstir ji çavên dê dibarin û wiha got: "Hezar carî şukur ji Xwedê Teala re. Nizanim mirov dikare jê re bibêje jiyan, nizanim. Lê tiştên hatin serê me, tenê em û Xwedê dizanin. Dizanim êdî ew roj qediyan, lê dê her di bîra me de be. Ji ber vê em minetdarên HSD'ê ne ku me rizgar kirin." Ji hundê Dahwaryê Emîne Eli ya 22 salî jî ku çend ferdên malbatê wê hatine kuştin û hatine revandin, da zanîn ku rizgarbûna ji çeteyan tê wateya dubare vegera li jiyanê. Dayika 4 zarokan Kevser Abdullah jî ku mala wê ji ber şer rûxiyaye, destnîşan kir ku bi rastî jî gelek jin ji mirinê hatin rizgarkirin û wiha axivî: "Em ê çawa deynê van mirovan bidin, em jî nizan in. Lê jiyana xwe avêtin xetereyê û em rizgar kirin. Ew rojên tarî li paş man. Xwedê bi wan re be."



www.arsivakurd.org

ROJEVA Medya
15 Çile 2017 Yekşem

# Dîmenên îşkenceyê derketin holê

Di 2'yê kanûnê de li navçeya Sûra Amedê qedexeya derketina derve hatibû îlankirin û li hemberî navçeyê bi tang û topan êrîş pêk hatibû û hatibû wêrankirin. Piştî şerê 103 rojan sivîlên ku di jêrzemînan de asê mabûn, di dema derketinê de polîsan ew binçav kiribûn. Dîmenê îşkencê û îstîsmarê ya ku tîmên taybet li Sûrê pêk anîne derketin holê. Di dîmenan de jinek tevî zarokên xwe yên 9-10 salî dema ku ji jêrzemînê derdikevin, li ser fermana tîmên taybet cilên xwe datînin. Zarokên ku cil û pêlavên xwe ji xwe dikin careke din rastî êrîşê tên. Li ser medyaya civakî li hemberî vê hovîtiyê bertekên mezin pêk hatin. AMED - ŞÛJIN



## Du leşker hatin kuştin

Artêşa tirk li bejahiya Bedlîsê derket operasyonê. Di encama operasyonê de şer derket û 2 leşkerên hatin kuştin, 2 jî birîndar bûn. Walîtiya Bedlîsê da xuyakirin ku di dema operasyona hêzên Fermandariya Herêmê ya Jendermeyan de, şer derketiye. Hat diyarkirin ku di vî şerî de 2 leşkerên li Fermandariya Tabûra JOH a Tetwanê mirine, 2 jî jê birîndar bûn. Li gorî agahiyan operasyon dewam dike. HPG'ê hê li ser mijarê daxuyanî nedaye. BEDLÎS

## Li 18 herêman îlana qedexeyê

Dewleta tirk a li Mêrdînê xwe ji bo operasyonê amade dike, 'herêmên ewlekariyê' îlan kir. Gelek herêmên navçeyên Şemrex, Stewr, Kerboran, Mîdyat û Nisêbînê yên Mêrdînê heta salekê bi hinceta "herêmên ewleh" li şêniyên navçeyan hatin qedexekirin. Walîtiya Tirk a li Mêrdînê di biryara xwe de ragihandin 18 herêm û 107 noqteyên li nava 5 navçeyên bajêr, heta 31'ê kanûnê hatine qedexekirin. MÊRDÎN

## Ji ber 'OHAL'ê nayê dermankirin

Hevşaredarê Qelqeliyê yê DBP'yî Şerafettîn Ozalp ku di 15'ê tîrmeha 2016'an de hat girtin û wî şandin Girtîgeha Tîpa E ya Gumuşhaneyê, tevî pirsgirênkên wî yên giran ê tenduristiyê ev 6 meh e nayê dermnakirin. Hevjîna Ozalp Zubeyde Ozalp li ser mijarê axivî û anî ziman ku wan gelek caran serî li rêveberiya girtîgehê û serdozgeriyê dane lê belê her carê ji wan re gotine 'OHAL' heye û nikarin di van şert û mercan de wî sewqî girtîgeheke din bikin. Ozalp diyar kir ku li girtîgehê bi sedan girtiyên nexweş hene û bang li raya giştî kir ku vê rewşê bibînin. WAN

# 'Dê êrîş bê bersiv nemîne'

**Artêşa tirk ku di êrîşan de tu sînoran nas nake dîsa nirxên pîroz ên gelê kurd hedef girtin. Artêşa tirk li herêma Metînayê şehîdgeh bombebaran kir û HPG'ê jî diyar kir ku dê ev êrîş bê bersiv nemîne**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê der barê bombebarankirina artêşa tirk a Metîna de agahî da. HPG'ê diyar kir ku di şeva 14'yê çileyê de saet di 01.00-01:30'an de bombebaran hatiye kirin. HPG'ê got ku balafirên şer ên tirk her wiha bombe li Şehîdgeha Metîna jî barandine.

Di daxuyaniya HPG'ê de ev tişt hat gotin: "Roja 14'ê çileyê saet di navbera 01:00-01:30'an de balafirên şer ên TC'ê derdora gundê Golika û malên li gundê Seferî yên navçeya Amêdiyê ya bajarê Duhokê bombebaran kirine. Di bombedûmanê de li gundê Seferî 2 xanî bi temamî hatine rûxandin û zirar li xaniyên, dehl û rezan çêbûye. Dîsa saet di navbera 01:00-01:30 û 04:30-05:00 de balafirên şer bombe li Şehîdgeha herêma Metîna barandiye. Ji ber vê bomberdûmanê zerar li şehîdgehê çêbûye. Artêşa tirk ku di şerê xwe yê qirêj de sînoran nas nake, bi êrîşa li dijî gorên şehîdên me, careke din rûyê xwe yê namerdî raxistiye berçavan. Cihê van êrîşên li dijî gundan di hiqûqa şer de nîne. Divê were zanîn ku em ê li hemberî van êrîşan bêdeng nemîn in." *BEHDÎNAN - ANF*



## Kujer dewlet e

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Amedê û xizmên windayan di hefteya 414'emîn de çalakiya "Bila winda bên dîtin û faîl bên darizandin" dewam kir û careke din li aqûbeta windayan pirsîn. Daxuyanî ji ber OHAL'ê li avahiya ÎHD'ê ya Amedê hat dayîn. Di çalakiyê de Serokê ÎHD'ê ya Amedê Racî Bîlîcî axivî û diyar kir ku ew bi salan e ji bo aqûbeta windahiyên xwe têdikoşin û anî ziman ku heta winda bên dîtin û kujer bên darizanin dê têbikoşin. Bîlîcî anî ziman ku heke windayên di salên 1990'î de bihatina dîtin dê îro jî komkujiyên wek Roboskî û yên din pêk nehatina û da zanîn ku heta berpirsên wan windayan dernekevin holê dê tu pirsgirêk neyê çareserkirin. Her wiha Bîlîcî ji bo bidawîkirina OHAL'ê bang li rayaderên hikumet û dewletê kir.

Piştî axaftina Bîlîcî çîroka Omer Onen ê k udi 14'ê çileya 1994'an de li Çinara Amedê hat windakirin hat vegotin. Hevjîna Onen, Nezîre Baran axivî û destnîşan kir ku kujera hevalê wê dewlet e û anî ziman ku heta zelalbûna aqûbeta hevalê xwe têbikoşe.

Her wiha Dayikên Şemiyê çalakiya xwe ya qada Galatasarayê di hefteya 616'an de berdewam kirin. Vê hefteyê nameya Dayika Hasan Ocak Emine Ocak a ji ber nexweş bû nekarîbû beşdarî çalakiyê bibe hat xwendin. Ocak diyar kir ku xwîna zarokên wan li vê qadê ye û wiha got: "Binerin dayik dimirin. Em dimirin. Ger ku dayik bimirin jî ev pirsgirêk xelas nabe. Heta ku hestiyên zarokên me hatin teşhiskirin bila gora me Qada Şemiyê be." *DÎHABER*






## Nasnameyên gerîlayan aşkera bûn


Asmîn Dara


Mazda Mariya


Botan Dogan


Diyar Gewda

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê, nasnameya 4 gerîlayên di sibata 2016'an de li Herêmên Parastinê yên Medyayê şehîd ketine aşkera kir. HPG'ê diyar kir ku hevalên wan Asmîn, Botan, Diyar û Mazda bi berxwedanî tev li nava têkoşînê bûne û got ku rêhevalên wan di şerê berxwedana 2016'an de li dijî artêşa tirk şehîd bûne.

HPG'ê destnîşan kir ku ew bi bîr û baweriyek mezin bûne hêviya gel û wiha hat gotin: "Em her çar hevrêyên xwe yên milîtan bi bi bîr tînin û dibêjin, em ê ruhê mezin ê di dilê wan de bidin jiyandin."

***Li gorî daxuyaniyê nasnameyên her çar gerîlayên ku jiyana xwe ji dest daye, wiha ne;***

✓ Behiye Komî (Asmîn Dara), cihê jidayikbûnê: Wan, cihê şehadetê: Sibat 2016 / Herêmên Parastina Medyayê.

✓ Dogan Tekîndag (Botan Dogan), cihê jidayikbûnê: Agirî, cihê şehadetê: Sibata 2016 / Herêmên Parastinê yên Medyayê.

✓ Salîh Acar (Diyar Gewda ), cihê jidayikbûnê: Wan, cihê şehadetê: Sibata 2016 / Herêmên Parastinê yên Medyayê.

✓ Şevîn Çoşkun (Mazda Mariya), cihê jidayikbûnê: Stenbol, cihê şehadetê: Sibata 2016 / Herêmên Parastinê yên Medyayê. *BEHDÎNAN - ANF*

## Jiyana girtiyan ne ewle ye

Li Girtîgeha Girtî ya Jinan a Gebzeyê, mafên girtiyan di asteke giran de tên binpêkirin. Girtiyên siyasî li qawîşên mehkûmên faşîst û edlî tên bicihkirin û zext li wan tê kirin ku li vir bijîn. Girtî dixwazin sewqa wan çêbibe, lê ev daxwaza wan nayê qebûlkirin. Rêveberiya girtîgehê bersiveke ne erênî, ne jî neyînî nade daxwaznameyan. Li vê girtîgehê, girtî di nava 4 rojan de 3 qewîşan diguherînin. Ji ber nêma li hucreyan, girtî bi zorê hilmê digirin. Girtî dibêjin, jiyana wan di nava van şert û mercan de ne bi ewle ye. Girtiyên siyasî li hucreyên kesên ku dikarin zerarê bidin wan û xwe, tên bicihkirin. Selvî Kalen diyar kir ku ji bo bê sewqkirin dê daxwazname nivîsandiye lê bersiv jê re hê nehatiye. Kalen di nameya xwe de qala rewşa li Girtîgeha Jinan a Gebzeyê dike. Kalan diyar kir ku wan ji wir di avê jin wir û li qawîşên ji 6 kesan pêk tê 8, 10 kes lê tên bicihkirin. Kalen destnîşan kir ku ew li gel kesên edlî tên girtin loma dibe ku zirarê bidin. *KOCAELÎ - ANF*

## Girtî dest bi greva birçîbûnê dikin

Girtiyên PKK'î yên li Girtîgeha Çankiriyê dimînin, beriya niha li dijî kamerayên ku dixwestin li destşok, serşok û qawîşên wan bên bicihkirin derketibûn. Piştî bertekên girtiyan dozgerê ku hat girtîgehê biryar da ku kamera neyên bicihkirin lê girtiyên xwe gihandine malbatên xwe diyar kirin ku kamera hatine bicihkirin. Girtiyan bi rêya malbatên xwe daxuyaniyek dan çapemeniyê û dan zanîn ku ew ê roja Duşemê dest bi greva birçîbûnê ya bêdem bikin û heta kamera bên rakirin ew ê çalakiya xwe bidomînin. Girtiyan bang li parêzvanên mafê mirovan û parlamenteran jî kirin ku bên girtîgehê û lêkolînan bikin. ÇANKIRI - DÎHABER

www.arsivakurd.org

## Ji bo aştiyê li hev rûniştin

**LI KOLOMBIYAYÊ** piştî peymana aştiyê ya bi FARC'ê re derket holê ku hikumeta Kolombiyayê û delegeyên tevgera gerîla ya herî mezin ELN jî li hev civiyane û dest bi hevdîtinên aştiyê kiriye. Hat ragihandin ku nûnerên hikumetê û ELN'ê roja înê li paytexta Ekvadorê Qutioyê li hev kombûne û li ser xalên aştiyê nîqaş kirine. Hikumet û ELN'ê ji çileya 2014'an ve bi dizî dest bi hevdîtin û amadekariyên danûstandinên fermî kiribû. Pêvajoya danûstaninên fermî ya ku dihate plankirin di 27'ê cotmeha 2016'an de li Ekvadorê bê destpêkirin, hatibû betalkirin. Hat ragihandin ku hikumeta Kolombiyayê ji bo destpêkirina pêvajoya aştiyê ji ELN'ê daxwaz kiriye ku wekîlê berê Odin Sanchez ê di destê wan de serbest bê berdan. BOGOTA



# Çareserî bêyî kurdan ne pêkan e

**Şandeyên dewletên garantor ên hevdîtinên Astanayê Rûsya, Îran û Tirkiyeyê hatin gel hev û dest bi amadekariyan kir. Amerîkayê gotinên Kalin ên têkildarî tevlîbûna Amerîkayê ya hevdîtinan derewandin**



Amadekariyên hevdîtinên Astanayê yên ku bêyî kurdan çareserî ji aloziya Sûriyeyê re tê xwestin, berdewam dikin. Şandeyên dewletên garantor ên hevdîtinan Rûsya, Îran û Tirkiyeyê li paytexta Rûsyayê Moskovê hatin gel hev û dest bi amadekariyên hevdîtinan kir.

Wezareta Karên Derve ya Rûsyayê der barê hevdîtinê de daxuyaniyek da û ragihand ku Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Mihail Bogdanov, Serokê Beşa Rojhilata Navîn û Afrîkaya Bakur ê Wezareta Karên Derve ya Rûsyayê Sergey Verşinin, Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Îranê Huseyîn Caberî Ensarî û Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyê Sedat Onal beşdarî hevdîtinê bûne û mijarên hevdîtinên Astanayê guftûgo kirine.

Di daxuyaniya wezaretê de hat ragihandin ku di hevdîtinan de nêrîneke hevpar derketiye holê û ji bo agirbesta Sûriyeyê bê mayîndekirin, biryar hatiye dayîn ku têkoşîna li dijî komên ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) ve wek rêxistinên terorîst hatine îlankirin, berdewam bike.

Li gel ku ji bo hevdîtinên Astanayê ew qas amadekarî tên kirin jî, ji aliyê gelek derdoran ve tê nîqaşkirin ku hevdîtinên Astanayê ji ber venexwendina kurdan wekî civînên beriya xwe vala derbas bibin û tu encam jî jê dernekeve. Li aliyê din ji ber nîqaşên di navbera aliyan de tê gotin ku hevdîtin pêk neyên û bên taloqkirin.

**KALIN DEREWAND**

Her wiha Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê bersiv da gotinên Berdevkê Serokomarê Tirkiyeyê Îbrahîm Kalin ên der barê tevlîbûna Amerîkayê ya hevdîtinên Astanayê de û ew derewand. Kalin beriya du rojan der barê hevdîtinên Astanayê de daxuyaniyek dabû û diyar kiribû ku dê Amerîka jî beşdarî hevdîtinên Astanayê bibe.

Berdevkê Wezareta Karên Derve yê Amerîkayê Mark Toner di civîna rojane ya çapemeniyê de ev gotinên Kalin derewandin û got ku bi awayekî fermî ji bo tevlîbûna hevdîtinên Astanayê nehatine vexwendin. *MOSKOV- WASHINGTON*

## Danekirinên Rûsyayê dirêj kirin



Serokê Amerîkayê Barack Obama beriya ku erka xwe dewrî serokê ayende yê Amerîkayê Donald Trump bike sepandina danekirinên li ser Rûsyayê yên der barê Ûkrayna û Kirimê de ji bo salekê dirêj kirin.

Amerîka di 2014'an de ji ber ku Girava Kirimê ji aliyê Rûsyayê ve hat dagirkirin û piştî demekê bi Rûsyayê ve hat girêdan, der barê Rûsyayê de biryara sepandina danekirinan da. Serokê Amerîkayê Obama beriya ku dev ji erka xwe ya serokatiyê berde, sepandina danekirinên Rûsyayê ji bo salekê careke din dirêj kirin.

Di daxuyaniyê têkildarî mijarê de hat destnîşankirin ku ji ber gefên Rûsyayê yên li ser Kirimê hêj berdewam dikin, pêwîstî bi dirêjkirina sepandina danekirinan hatiye dîtin.

Piştî aşkerabûna vê biryara Obama serokê ayende yê Amerîkayê Trump der barê mijarê de daxuyaniyek da û diyar kir ku heke diyalog bi Rûsyayê re bê bipêşxistin dibe ku sepandina danekirinên li ser Rûsyayê bên rakirin.

Li aliyê din Obama bi armanca teşwîqkirina performansa di mijarên têkoşîna li dijî terorîzmê de danekirinên bazarî yên li ser Sûdanê jî rakirin. *WASHINGTON*



## Doza komkujiyê betal kirin

Doza der barê komkujiya Maillê ya Fransayê ku dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn ji aliyê naziyan ve pêk hat, bi hinceta ku leşkerên tev li komkujiyê bûyî sax nemane, hat girtin. Lêpirsîna der barê komkujiyê de ji aliyê dozgeriya bajarê Dortmundê yê Almanyayê ve hat meşandin.

Dozgeriyê der barê komkujiyê de daxuyaniyek da û diyar kir ku ji ber ku naziyên tev li komkujiyê bûne sax nemane pêwîstî bi vekirina dozê tune ye. Fransiyên aliyekî vê lêpirsînê ne, bi rêya parêzerên xwe îtîraz kir. Li aliyê din li ser navê kesekî ku sax ji komkujiyê filitiye û malbatên mexdûr, îtîraz li Dozgeriya Giştî ya Hammê ya li parêzgeha Nordrhein Westfalenê hat kirin.

Li gundê Maillê yê bakurê Fransayê di 24'ê Tebaxa 1944'an ango roja rizgariya Parîsê de ji aliyê naziyan ve komkujiyeke mezin pêk hat. Di vê komkujiyê de 124 kesên temenê wan di navbera 3 mehî û 89 saliyê de jiyana xwe ji dest da. Komkujiya Maillê di lîsteya Neteweyên Yekbûyî ya li ser sûcên şer de cih digire. *PARÎS*

## Zanîngeha Mûsilê hat rizgarkirin



Di çarçoveya qonaxa duyemîn a operasyonên rizgarkirina Mûsilê de Zanîngeha Mûsilê hat rizgarkirin. Fermandarê artêşa Iraqê Abdul Emîr Raşît der barê pêşveçûnên artêşa Iraqê de agahî dan çapemeniyê û ragihand ku di encama operasyonên xwe yên serkeftî de bînaya Zanîngeha Mûsilê û gelek bînayên girêdayî zanîngehê ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirine. Hat ragihandin ku çeteyên DAIŞ'ê bînayên zanîngehê ji xwe re ji bo xebatên xwe yên herêmê wek baregehên leşkerî bi kar anîne û piştî têkçûna xwe gelek xisar daye bînayan. *MÛSIL*

## Di êrîşa xwekujî de 15 kes mirin

Li Nîjeryayê di van rojan de ku derbên giran li çeteyên Boko Haramê dixin, êrîşeke xwekujî pêk hat. Erîş li bajarê Madagaliyê yê girêdayî parêzgeha Adamawa ya dikeve bakurê rojhilatê Nîjeryayê pêk hat û di encamê de 15 kesan jiyana xwe ji dest da û gelek kes jî birîndar bûn. Ji ber ku tu rêxistinan êrîş negirtiye ser xwe, tê gumankirin ku êrîş ji aliyê çeteyên Boko Haramê ve pêk hatibe. ADAMAWA

## Operasyona li dijî hevkarên DAIŞ'ê

Li Misrê di navbera komeke hevkariya çeteyên DAIŞ'ê dike û hêzên ewlekariyê de şer derket. Der barê bûyerê de Wezareta Karên Hundir a Misrê daxuyaniyek da û ragihand ku şer li herêma Sînayê di encama operasyona li dijî koma bi navê Ensar Beyt El Muqdes de derketiye û 10 çeteyên komê ji aliyê hêzên leşkerî ve hatine kuştin. Hat ragihandin ku kom di 2014'an de 'bîat' ji çeteyên DAIŞ'ê re kiriye. QAHÎRE

## Bi sedan penaber rizgar bûn

Bi sedan penaberên ku hewl dida ji Lîbyayê derbasî Îtalyayê bibin ji aliyê saziyên alîkariyê ve hatin rizgarkirin. Hêza Ewlekariya Peravên Îtalyayê Guardia Costierayê der barê rizgarkirina penaberan de daxuyaniyek da û diyar kir ku 550 penaberên ku bi botên lastîk dixwestin derbasî Îtalyayê bibin noqî avê bûne û ji aliyê saziyên alîkariyê ve hatine rizgarkirin. Her wiha ragihand ku du penaberan jiyana xwe ji dest daye. ROMA

## Berpirsê çeteyên biyanî kuştin

Berpirsê hemû çeteyên biyanî yên DAIŞ'ê hemwelatiyê Holandayê yê bi navê Ebû Omer Holandî (Ties Bill Monte – 41) li Mûsilê hat kuştin. Hat ragihandin çete Ebû Omer Holandî yek ji çeteyên payebilind ê DAIŞ'ê bûye û di nav tîma heta mirinê şer dikirin de, bûye. Her wiha hat gotin ku çete Ebû Omer Holandî dostê serokê çeteyên DAIŞ'ê Ebûbekir Bexdadî ye û roleke wî ya girîng di nav çetayan de hebûye. MÛSIL

ROJEVA Medya
15 Çile 2017 Yekşem

# 45 gund û 20 mezra hatin rizgarkirin

Şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê ku çend roj berê bi rizgarkirina gundê Kurmanco 45 gund û 20 mezra xistibûn dorpêça xwe, di encama operasyonekê de ev gund û mezra bi tevahî rizgar kirin.

Li gorî agahiyên ji herêmê, şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê di çarçoveya qonaxa duyemîn a hemleya Xezeba Firatê de di 11'ê çileyê de bi rizgarkirina gundê Kurmanco her du baskên operasyonê gihandibûn hev. Bi vê yekê jî 45 gund û 20 mezrayên di bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de xistibûn dorpêçê. Hat zanîn di encama operasyona şervanan de her 45 gund û mezra ji çeteyên DAIŞ'ê hatin rizgarkirin.

Bi kontrolkirina herêma dorpêçkirî, çargoşeya Odeya Çalîkayan ya Xezeba Firatê ku di hemleyê de xistine bin kontrola xwe gihaşt 2644 km2. **REQQA - ANHA**



## Psîkolojiya leşkerên tirk têk çûye

ŞÎLAN MIHEMED / MINBIC - ANHA

**Endamên ku ji komên çete yên girêdayî Tirkiyeyê veqetiyane destnîşan kir ku hejmareke mezin ji çeteyên Tirkiyeyê li herêmên Şehbayê hatine kuştin û teqez kir ku artêşta tirk piştî ku çeteyên DAIŞ'ê 2 leşkerên wan şewitandin, ketine nav tevliheviyê.**

**Xitimandina ku artêşa tirk a dagirker li herêma Şehbayê dijî, her ku diçe zelaltir dibe. 2 kesên ku di koma çete ya Tabûra Siqûr El Şemal ku piştgiriya xwe ji Tirkiyeyê digirin veqetiyan û tev li Meclisa Leşkerî ya Minbicê bûn, anî ziman ku ew ji ber kiryarên artêşa tirk ên li dijî sivîlan jê veqetiyane û tev li Meclisa Leşkerî ya Minbicê bûne.**

**Van kesên bi navên E.M û M.E diyar kir ku çeteyên Tirkiyeyê li dijî welatiyên herêmê kiryarên dijmirovî pêk tînin û ev tişt vegotin: "Mal û milkê welatiyan talan dikin. Dewleta tirk piştgiriya komên çete dike. Wan li gorî daxwazên xwe bikartîne û tekane armanca çeteyan jî komkirina pereyane. Yên ku niha herêmê dagir dikin jî komên çete yên Siqûr El Şemal, Feyleq, Ceyş El Islam, Ehrar El Şam, El Qaqa, Sultan Murad, Tabûrên Idlibê û Hemzat in."**

**BAREGEHA SEREKE**

**Van kesan anî ziman ku artêşa tirk baregeha xwe ya sereke li bajaroka El Raiyê vekiriye û wiha bi dawî kir: "Li vir jî herêmê kontrol dikin. Gelê resen ê herêmê bi darê zorê koçber dikin û malbatên ku ji Tirkiyeyê anîne bicih dikin. Ev çete yên tên herêmê jî li Tirkiyeyê tên perwerdekirin. Di nava artêşa tirk de parçebûneke mezin heye. Bûyera şewitandina leşkerên tirk ji hêla DAIŞ'ê ve bandorek mezin li ser derûniya wan kiriye."**

# Çeteyan jinek recm kir!

**Komên çete li ser îdiayake derew Zehrayê digirin û bi rojan îşkence dikin. Herî dawî jî ji ber ku çeteyê DAIŞ'ê qaşo 'dadger' aciz dike li ber qeraxê çemekî tê recmkirin û cenazeyê wê nîşanî gel didin**

SEYÎT EVRAN / MINBIC - ANF



Çeteyên DAIŞ'ê ku 2 salan Minbic dagir kiribûn, bi zilm, komkujî û îşkenceyê ket bîra mirovan. Piştî ku Minbic hat rizgarkirin, asta hovîtiya DAIŞ'ê ya li gel dikir jî hêdî hêdî aşkera bû.

Yek ji hovîtiya DAIŞ'ê li Minbicê kir jî komkujiya recmkirina 6 jinan bû ku li pêş çavên gel kir. Yek ji jinên ku di 2015'an de li qiraxa çemê bajêr hatî recmkirin jî Zehra Eceylo ye.

**BÊ DELÎL GIRTIN**

Xwîşka Zehra Eceylo ya bi navê Radwa çîroka xwîşka xwe wiha anî ziman: "Bi hinceta ku li mala me çek heye, avêtin ser mala me û tevî tiştek nedîtin xwestin Zehrayê bibin. Tevî gazincên me jî gotin pêdivî bi belgeyan tuneye û ez, Zehra û birayê min girtin. Li baregeha xwe îşkenceyên giran li me kirin. Piştî 3 rojan em darizandin û bi îdiayên derew em girtin."

**DAXWAZA ÇETEYAN**

Radwayê da zanîn ku çeteyê qaşo dadger jî bo serbestberdana wê xwestiye ku xwîşka xwe bi zînayê tawanbar bike û wiha domand: "Piştî min qebûl nekirî, salek ceza dan min û Zehra jî bi cezayê zînayê darizandin. Ji me re gotin ku cîranên me ev gilî kiriye. Piştre jî Zehra birin û êdî min ne dît."

**ZEHRA QETIL KIRIN**

Xwîşka Zehrayê wiha didomîne: "Di zindanê de cîranê me yê gilî kirî û Zehrayê tînin cem hev. Cîranê me wiha ji Zehrayê re gotiye; 'Min gotibû ezê bêvila te bi erdê re kaş bikim.' Zehrayê jî wiha gotiye; 'Ne girînge. Ya girîng ew e ku ez bêguneh im'. Çend roj piştre hin jinên kurd ên êzidî anîn cem me. Yek ji ducanî bû û kirin ku zarok ji ber biçe. Jin di avêtin odeyekê û desdirêjî wan dikir. Piştî recmkirina Zehrayê em berdan. Cenazeyê Zehrayê jî li cihekî nîşanî herkesî dida."

**TOLA WÊ HILTÎNE**

Yek kesên ku Zehrayê dibîne jî birazayê wê yê ku niha li nava şervanên Şems El Şemal de cih digireye. Birazayê Zehrayê, Saîd bûyerê wiha tîne ziman: "Jineke recmkirî nîşanî gel didan. Ez sekinandim û nîşanî min jî dan. Wê demê min zanî ku meta min e. Dema ku min bihîstî ez çûm cem Ebû Leyla û tevli Şems El Şemal bûm. Min xwest tola van mirovên bêgune hilînim. Me hiland jî."

## Di xewnê de dît

**XWÎŞKA ZEHRAYÊ** Radwa di axaftina xwe de dibêje ku beriya ku Zehra ji hêla çeteyan ve were qetilkirin, di xewna xwe de dibîne û xewna xwe wiha vedibêje: "Min dest bi bêhnkirina eşyayên Zehrayê kir. Bi vî awayî bi xew ve çûbûm. Min di xewna xwe de Zehra dît ku dihat û li cem min rûdinişt. Ji min re wiha digot; 'Dê min îro saet 2'yan de recm bikin û li xwe miqatebin'. Min jê re digot ku ez dixwazim li cem wê bim lê wê wiha besiv dida; 'Na ger bibînî tu yê îdare neke û berî min bimirî'. Bi hişyarbûnê re ez ji ser hişê xwe çûm."

## TEV-DEM bi gel re civiya

**Xebatên TEV-DEM'ê yên ku bi armanca birêxistinkirina welatiyên li herêmên hatin rizgarkirin daye destpêkirin, didome. Di vê çarçoveyê de endamên TEV-DEM'ê bi welatiyên bajaroka Mehmûdiyê re civînek li dar xist. Di axaftinên civînê de hat gotin ku ew bi vê civînê dixwazin welatiyên ji herêmê vegerin warên xwe û jiyana xwe li ser esasên jiyana hevbeş û biratiya gelan saz bikin. Di civînê de bang li gelê bajarokê hate kirin ku vegerin malên xwe. Welatiyan jî ji bo rizgarkirina bajaroka wan spasiya şervanan kir. KOBANÊ**

## Xebat Dêrik hate bibîranîn

**Bi boneya 5'emîn salvegera şehadeta fermandar û damezirînerê YPG'ê Xebat Dêrik hêzên YPG'ê yên Helebê merasîmeke bîranînê li dar xist. Di merasîmê de bi dehan şervanên YPG/YPJ'ê amade bûn. Di merasîmê de şervanan merasîmeke leşkerî li dar xist. Di merasîmê de endamê Fermandariya YPG'ê ya Helebê Şervan Efrîn axivî û şehîd Xebat Dêrik bi bîr anî. Efrîn di dawiyê de jî soza şopandina rêya şehîdan da. Merasîm bi dirûşman bi dawî bû. HELEB**





## Li dijî Astanayê çalakî

Bi sedan welatiyên ji Girê Spî bi armanca tevlîbûna nûnerên rasteqîn ên bakurê Sûriyeyê tev li danûstandinên ji bo çareseriya Sûriyeyê bibin, çalakiyek li dar xist. Di çalakiyê de hat gotin ku divê teqez nûnerên rêveberiyên xweser tev li civîna Astanayê bibin.

Bi pêşengiya TEV-DEM'ê bi sedan welatiyên Girê Spî bi dirûşmeya 'Ên li berxwe didin tenê dikarin maseya diyalogê li hevbikin' li navenda bajêr çalakiyek li dar xistin. Di çalakiya ku bi meşekê destpêkirî de pankarta 'Civîna Astanayê ji bo gelên Sûriyeyê bi serkeftî na be' hat vekirin. Çalakvanan xwestin ku nûnerên rasteqîn ên gelê herêmê beşdarî hevdîtinên der barê aloziya tê lidarxistin, bibin. Her wiha çalakvanan xwestin ku nûnerên rêveberiyên xweser di civîna Astanayê de jî cih bigirin.

Di çalakiyê de tevî bi sedan welatiyên bajêr, her wiha bi dehan serokeşîr û rûspiyên herêmê jî amade bûn. Çalakî li ber çarxerêya Alê bi dirûşmeyan bi dawî bû. *GIRÊ SPÎ - ANHA*

## Gelê Minbicê dê xwe biparêze

Meclisa Leşkerî ya Minbicê got ku li dijî hemû êrîşan mafê xwe yê parastinê bi kar bînin.

Têkildarî êrîşên artêşa tirk ên li dijî gundê Ewin El Dadat a Minbicê, Meclisa Leşkerî ya Minbicê daxuyaniyek weşand. Di daxuyaniyê de hat gotin ku dewleta tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê di rojên dawîn de gundê Ewin El Dadat ê Minbicê topbaran dike û ev tişt hat parvekirin: "Bi awayekî hemwext çeteyên DAIŞ'ê jî êrîşî eniya başûr kir. Ev êrîş, bi armanca têkbirina aramiya Minbicê pêk tên."

Di dawiyê de jî ev tişt hatin gotin: "Em wekî meclisa leşkerî teqez dikin ku em ê parastina noqte, baregeh û gundên xwe bikin. Ev yek li ser esasê mafê xweparastinê pêk tê û me ev soz daye gelê xwe ku em ê parastina herêmê bikin. Mafê me heye ku em parastina herêmên xwe bikin." *MINBIC - ANHA*

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
15 Çile 2017 Yekşem

# Xal bi xal faşîzm

**Di meclisa Tirkiyeyê de qanûnên ku rê li ber faşîzmê vedikin yek bi yek tên erêkirin. Hiqûqnasan diyar kir ku bi van qanûnan dê Erdogan hêza xwe zêdetir bike û êdî kes nikare wî kontrol bike**



## Diyar bû ku qanûna faşîst e

Parlamenterê HDP'ê Garo Paylan ji ber ku di koma meclîsê de gotina "komkujî" bi kar anî, rastî cezayê beşdarî 3 civînên meclîsê nebe hat û ev gotin ji girtekan hat derxistin.

Garo Paylan bal kişand ser şaşiyên demên borî. Paylan da zanîn ku di Şerê Yekemîn ê Cîhanê de gelê ermenî, rûm, suryanî û cihû hatine windakirin û ger heman şaşî bidomin dê careke din êş bên kişandin. Paylan anî ziman ku MHP'ê gefa ku ger ceza li wî neyê birîn dê piştgiriya xwe ya ji bo guhertina makeqanûnê bikişînin ji AKP'ê xwarine. Paylan wiha axivî: "Diyar bû ku ev qanûna bingehîn a faşîst e. Ev rûdana; ji niha û pê de hûn ê li gorî daxwaza me biaxivin. Ev peyama ger hûn tiştên em dixwazin nekin em ê dengê we qut bikin bû." ENQERE

Di meclisê de guhertinên makeqanûnê dewam dikin. Xalên 9, 10, û 11'emîn hatin erêkirin.

Xala 9'emîn a pêşniyara guherandiya makeqanûnê ku dê "berpirsyariya cezaî" ya serokomar sererast bike hat qebûlkirin. Di 57'emîn pevcivîna hevdîtinên guherandiya makeqanûnê ku bi tevkariya AKP û MHP'ê pêk tê de, piştî hevdîtinan dengdayîna xala 9'emîn pêk hat. Di yekemîn tûra dengdayîna xalê de, xal bi 343 dengan hat qebûlkirin.

Di guherandina makeqanûnê de xala 10'emîn a dê "alîgirên serokomar" diyar bike bi 343 dengan hat qebûlkirin. Piştî axaftinên li ser navê şexs û koman, pêşniyarên guherandinê hatin vegotin û hevdîtin bi dawî bûn. Di encama dengdayînê de, xala 10'emîn jî wek xalên din hat qebûlkirin. Di dengdayînê de 348 parlamenteran deng bi kar anîn. Di encamê de 343 dengên erê û 135 dengên na hatin bikaranîn.

Xala 11'emîn bi 341 dengan hat qebûlkirin. Her wiha ji bo xala 11'emîn 134 dengên na hatin dayîn. Pêşniyara guherandinê sererastkirina têkildarî hilbijartinan di xwe de dihebîne û heke pêşniyar bê qebûlkirin, ji



endamên meclisê bi piraniya ji pêncan sê dê biryara nûkirina hilbijartinan bê dayîn.

Endamê Yekitiya Dadgerên Nû dadger Philip Kersting ê li Almanyayê ji bo guhertinên makeqanûnê diyar kir ku ev guhertin di zagonan de dê hêza serokomar zêde bike û êdî kes nikare wî kontrol bike.

Dadger Kersting ji bo guherandina makeqanûnê ya li meclisê wiha got: "Di peywendiya rêgeza veqetana hêzan de dê bi pirsgirêk be. Guherandina bê kirin dê serokomar bigihîne hêzeke ku dê neyê kontrolkirin." Kresting bal kişand ser çewisandinên li Tirkiyeyê yên li dijî parêzeran û wiha got: "Min hin agahî ji çapemeniyê wergirtin. Li Tirkiyeyê parêzer rastî pêkutî û çewisandinan tên. Li gorî feraseta li Almanyayê dikarim vê bibêjim, parêzer ji bo parêziya civakê xwedî erkeke jiyanî ne. Bi rastî jî divê ew bêyî tirs û xof xwedî derfetên xebatê bin. Li gorî divêtiya karên xwe divê bêyî tirs parêziya muwekîlên xwe bikin." *ENQERE*

## Divê Ahmet Turk bê berdan

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Îzmîrê ji bo balê bikişînin ser rewşa girtiyên nexweş ên li girtîgehan li ber Konak Eskî Sumerbankê daxuyaniyek da çapemeniyê.


Di daxuyaniya ku endamên komeleyê û nûnerên partiyên siyasî û saziyên civaka sivîl tev lê bûn de pankartên "Tipa edlî bû darvekirin, daraz biryara înfazê dide" û "Bê deng nebe û nebe şirîkê sûc" hatin vekirin. Li ser navê komeleyê rêvebirê komeleyê Ahmet Çîçek axivî û bal kişand ser rewşa hevşaredarê Mêrdînê Ahmet Turk ê beriya niha hatibû girtin. Çîçek da zanîn ku tenduristiya Turk her ku diçe girantir dibe û divê Turk serbest bê berdan. *ÎZMÎR*



## Ji bo rojnameger Çaksu ceza

Gerînendeyê Giştî yê rojnameya Ozgurlukçu Demokrasiyê Ersîn Çaksû Midûrê Karên Nivîsan ê rojnameyê yê berê Harûn Eplî li Adlîyeya Stenbolê derketin pêşberî dadger.

Bi îdiaya Ersîn Çaksu û Harûn Eplî propagandaya rêxistinê kirine dozger ji bo wan ceza xwest. Heyeta dadgehê bi hinceta ku daxuyaniya rêxistinê di rojnameyê de weşandine salek, mehek û 10 roj û bi îdiaya propagandaya rêxistinê kirine 2 sal û 8 meh ceza li Çaksû û Eplî birîn. Cezayê ku ji bo Çaksû û Eplî hat birîn, hat taloqkirin. STENBOL





## Rojnameger Turan hat binçavkirin

Rojnameger Semra Turan li Çewlikê di serdegirtina malê de hat binçavkirin.

Semra Turan, di çarçoveya lêpirsîneke der barê wê de, bi îdiaya "propagandaya rêxistinê kiriye" hat binçavkirin û ew birin Midûriyeta Polîsan a Bajêr. Polîsan piştî binçavkirinê ji malbata Turanê re agahî şand û diyar kir ku dê heta duşemê di bin çavan de bê ragirtin. Hat zanîn ku di serdegirtina malê de polîsan 3 wêneyên PKK'yiyan xistine çenteyê Turan û ev wêneyên di çente de kirine sedema binçavkirinê. Xwediyê malê ku bû şahidê binçavkirinê diyar kir ku polîsan wêne xistine çenteyê Turan. ÇEWLÎG

## Êdî bûye înfaza bêdaraz

Rojnameger Omer Çelik, Metin Yoksu, Tunca Ogreten, Mahir Kanaat, Derya Okatan û Eray Sargin 22 roj in di bin çavan de ne.

Têkildarî rojnamegeran, heta niha tu delîl jî teblîxî parêzeran nehatine kirin. Parêzerên rojnamegeran dixwazin bi dozger re hevdîtinê bikin û der barê naveroka dosyayê de agahiyan bigirin. Lê dozger her car bi hincetên cuda daxwaza parêzeran red dike.

Gerînendeyê Weşana Giştî yê rojnameya Evrenselê Fatîh Polat, di "Sempozyuma Azadiya Ramanê" ku ji bo bîranîna rojnameger Ugur Mumcu, Metin Goktepe û Hrant Dink hat lidarxistin de diyar kir ku 6 rojnameger 22 roj in di bin çavan de ne û binçavkirina 22 rojan êdî bûye înfaza bêdaraz. *STENBOL*



## Ji bo serokdewletiyê binçav dikin

HDP'a Nisêbînê binçavkirina 10 kesên di nav de hevşaredarên Nisêbînê Sara Kaya û Cengiz Kok jî heye bi daxuyaniyekê şermezar kir.

Endam û rêveberên DBP'ê û Parlamenterê HDP'ê yê Mêrdînê Ali Atalan, Parlamentera HDP'ê ya Şirnexê Leyla Birlik, Hevserokê HDP'ê yê Nisêbînê Hamit Tokay û gelek rêveberên DBP'ê li avahiya HDP'ê ya Nisêbînê kom bûn û civîna çapemeniyê pêk anin. Atalan diyar kir ku armanca girtin û binçavkirinan amadekariya rejîma serokdewletiyê ye. *MÊRDÎN*



## Ji bo Ferhat Encû îdianameya nû

Di îdianameya duyemîn a der barê Parlementerê HDP'ê yê Şirnexê Ferhat Encu de, ji ber axaftinên di nobeta edaletê ya komkujiya Roboskê û parvekirinên yên medyaya civakî, heta 22 sal cezayê girtîgehê hat xwestin.

Di îdianameyê de, di çarçoveya xebatên partiya siyasî beşdarbûna çalakiyên di navbera salên 2015-2016'an de, di dema qedexeyên derketina derve de çûyîna wî ya Silopiya û Hezexê, parvekirinên li ser hesabê Twitterê yê têkildarî binpêkirinên mafan hemû sûc hatine dîtin. *AMED*

# Ji Luksemburgê heta Strasbourgê

**Di 18'mîn salvegera Komploya 15'ê Sibatê dê bi dirûşma 'Azadî ji Ocalan re, statu ji Kurdistanê re' ji Luksemburgê heta Strasbourgê bimeşin. Meş dê di 1'ê sibatê de dest pê bike û di 10'ê sibatê de bi dawî bibe**

Kurdên li Ewropayê dê di pêşengiya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Fransayê (CDK-F) de di 18'mîn salvegera Komploya 15'ê Sibatê ango roja radestkirina Rêberê Gelê Abdullah Ocalan a Tirkiyeyê de, dê ji Luksemburgê heta Fransayê bimeşin.

Meşa dirêj wê ji bo şermezarkirina radestkirna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a Tirkiyeyê pêk bê. Kurd dê bi slogana "Azadî ji bo Ocalan, statu ji bo Kurdistanê" bimeşin. Meşvan dê ji Luksemburgê berê xwe bide Fransayê û piştî bajarên



Audin-le-Tiche, Thionville û Talange, bigihîjin bajarê Metzê. Di plana meşê de dê li bajarê Metzê konferansek li ser pirsgirêka kurd bê lidarxistin û piştre meş ber bi bajarên Landremont, Saint-Avold, Puttelange-aus-Lac, Sarre-Union û Phalsbourgê dewam bike. Çalakgerên meşa dirêj dê di 10'ê Sibatê de bigihêjin Strasboûrgê û li herêma ku saziyên Parlamenta Ewropa û Konseya Ewropa lê ne, daxwazên xwe bi dengekî bilind nîşan bidin.

Çalakger dê dûre di 11'ê Sibatê de beşdarî meş û mîtînga mezin bibin û dawî li çalakiyê bînin. Rêveberên CDK-F Huseyîn Salîh Dûrmûş ji rojnameya Rebûblîcaîn Lorraîn re axivî û diyar kir, di çalakiyê de wê daxwaza wan a 'Azadî ji Ocalan re, statu ji Kurdistanê re' derkeve pêş. *BRUKSEL*

## Navê din ê yekitiyê Ocalan e

**HEVBERDEVKA HDK'ê Gulistan Koçyigit gavavêtinên der barê yekitiya netewî û tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan nirxand.**

**Koçyigit anî ziman ku ew dibînin ku îro jî dubare Rojhilata Navîn ji nû ve tê dîzaynkirin û ji bo ku kurd dubare nekevin xefka çewtiyên 100 sal berê divê "Yekitiya Netewî ya Kurd" pêk bînin û wiha got: "Divê her kes baş bizanibe, dema 'Yekitiya Netewî ya Kurd' pêk bê, dê hemû kurd bi ser kevin. Tekane riya rizgariyê ya her çar parçeyên Kurdistanê ev e."**

**Koçyigit bal kişand ser bangên Ocalan ên ji bo yekitiyê û wiha got: "Di warê yekîtiya netewî de navê herî girîng ê banga yekîtiya netewî dike birêz Ocalan e. Ji ber vê îro rastî tecrîdeke giran tê. Li her deverên Kurdistanê bêyî li pozîsyon û statuyê bê nihêrîn, divê her kes li dijî tecrîd û girtina birêz Ocalan helwesta xwe nîşan bide."**

**Koçyigit destnîşan kir ku tecrîd sûcê li dijî mirovahiyê ye û wiha got: "Birêz Ocalan 18 sal e rastî tecrîda giran tê. Ji 5'ê Nîsana 2015'an ve di bin tecrîdeke mutleq de ye. Berpirsyarê vê tecrîda giran û binpêkirina mafên mirovan AKP bi xwe ye. Li Îmraliyê berxwedana aştî, jiyan û azadiyê didome. Divê her kes dengê xwe li dengê vê berxwedanê zêde bike." İZMÎR**



## Şengal xweseriyê dixwaze

Bi boneya 2'yemîn salvegera damezirandina Meclisa Avaker a Şengalê, meclisê daxuyaniyeke nivîskî da. Meclisê diyar kir ku ew ji bo xweseriya Şengalê amadekariyê dikin.

Bi boneya 2'yemîn salvegera avakirina Meclisa Avaker a Şengalê daxuyanî hat dayîn. Di daxuyaniyê de hat bibîrxistin ku fermaneke mezin hatiye serê gelê êzidî, gel li hemberî êrîşan bi awayekî demokratîk meclis ava kiriye, hêzên leşkerî YBŞ û YJŞ hatine damezirandin.

Meclisa Şengalê wiha dewam kir: "Li gorî bernameya Meclisa Avaker amadekarî tên kirin ku xweseriya Şengalê were ragi-




handin. Ji ber ku ev daxwaz ya gelê em tevan e, êdî dixwazin xweser bijîn. Li gorî destûra bingehîn a Iraqê ya xala 125'ê naveroka vê xalê maf dide hemû kêmnetewên Iraqê ku xweseriya xwe ragihînin. Em jî wek gelê êzidî daxwazê ji hikumeta Iraqê dikin ku vê xalê bi cih bikin û helwestên xwe aşkera bikin. Tradejiya ku hate ser gelê me û ji bo ji van tengasiyan derkevin û naskirina hemû mafên gelê me yên rewa wek hemû gelên Iraqê bi serbestî jiyana xwe berdewam bikin."

Meclisa Avaker a Şengalê wiha pê de çû; "Her wiha em daxwazê ji Neteweyên Yekbûyî, hemû rêxistinên mafên mirovan û bergiriya mafên kêmnetewan dikin, doza me bişopînin û çareser bikin, fermana bi ser gelê me de hat, wek jenosîd qebûl bikin. Hêzên navnetewî hemû cihên ku êzidî lê dijîn parastina wan bikin û komîteyeke navnetewî were avakirin ji bo şîrovekirina sedemên fermanê û kesên berpirs û destên wan nava fermanê de hene bibin dadgehê û werin darizandin, da ku cezayê xwe wergirin." *ŞENGAL -ROJNEWS*

## Ciwan xweseriyê dixwazin

**LI DIJÎ HER şêwe gef û êrîşên li dijî Şengalê, ciwanên Şengalê ji bo ewlekarî û parastina xwe daxwaza Şengaleke xweser dikin.**

**Ciwanê bi navê Emer Xidir ragihand ku ew Şengalek xweser û azad dixwazin û wiha got: "Em Şengaleke xweser dixwazin. Rêveberî, biryar, hêz, artêşa me em dixwazin ji me be." Ciwanê bi navê Îdo Şekir destnîşan kir ku eger ew Şengaleke demokrat, pirreng û hemû bawerî tê de bijîn dixwazin û tekane rêya wê xweserî ye.**

**Şekir wiha dewam kir: "Eger Şengal xweser nebe wê êzidî û gelên din jî di nava metirsiyê de bin. Em bang li gelê xwe dikim ku vegerin Şengalê û xwedî li hêza YBŞ û YJŞ'ê xwedî derkevin. Ji derveyî YBŞ/YJŞ'ê tu hêzên din Şengalê naparêzin. Em xweseriyê dixwazin, ne girêdayî Hikumeta Herêmî, ne jî girêdayî Iraqê be. Em Şengaleke xweser û azad dixwazin." ŞENGAL - ANF**

## Ji ciwanên Başûr peyama watedar

Bi sedan ciwanên başûrê Kurdistanê ku li ser gef û êrîşên li dijî gerîlayan kom bûn, berê xwe da çiyayê Qendîlê yê girêdayî Herêmên Parastinê yên Medyayê. Ciwanan li Qendîlê daxuyaniyek da û diyar kir ku piştgiriyê didin gerîla.


Di daxuyaniyê de hate gotin ku gerîla li gelek deverên cuda li dijî êrîşên dijmin şer dikin û serkeftinên mezin bi dest dixin û ew bi tu awayî êrîşên li ser gerîlayan napejirînin û îfade kir ku PKK mîsogeriya jiyana azad e.

Di daxuyaniyê de ev wiha hat gotin: "Em bi tu awayî rê nadin ku hêzên dagirker li ser vê xakê bimînin û bêrûmetiyê li vê xaka ku bi xwîna şehîdan hatiye avdan bikin. Tevî ku hêzên dewleta tirk xaka başûrê Kurdistanê bi balafirên şer bombedûman dike û welatiyên sivîl qetil dike, heta niha hikumeta Başûr tenê bertekek jî nîşan nedaye. Gerîla hêza tekane ye ku hemû Kurdistanê diparêze. Ji bo vê jî em nîşan didin ku li gel hêzên gerîla cih digirin." *QENDÎL - ANF*



Fanos

## Rewşa li Tirkiyeyê wisa naçe?



M. Emîn Yıldirim

Em ji kîjan alî ve li rewşa Tirkiyeyê mêze bikin, tiştê ku tê xuyakirin krîz û alozî ye. Di roja îro de krîz û aloziya ku Tirkiye tê de ye piralî ye, fatûreya vê krîz û aloziyê ji bo civaka Tirkiyeyê pir xeternak e. Dîktatoriya Erdogan û desthilatdariya AKP'ê rasterast Tirkiye xistiye nava felaketekê û ji gelên li Tirkiyeyê re bûye kabûsek.

***

Rewşa li Tirkiyê dê nekare wisa bidome. Bêguman nikare bidome jî, çima ku krîzeke pir kûr a siyasî lê heye. Hemû dîktator ji navê îstîkrarê pir hez dikin û li ser navê îstîkrarê pir tiştan pêk tînin. Lê di roja îro de tu kes nikare bibêje li Tirkiyeyê îstîkrar heye, tiştê heyî alozî ye. Derveyî Erdogan û desthilatdariya AKP'ê kesekî ku ji rewşa îro razî û bibêje îstîkrar heye, tune ye. Rewşenbîr, akademîsyen, kedkar, jin, civaka elewî bi giştî bertek û nerazîbûnek heye. Ev nerazîbûn kîjan wextê, bi çi şêwazî bi serê dîktatoriya Erdogan de biteqe, ne diyar e.

***

Rewşa li Tirkiyeyê wisa naçe. Çima ku aboriya Tirkiyeyê ne baş e û krîzeke mezin li ber derî ye. Rexmî hemû hewldan û bangawaziya Erdogan aboriya Tirkiyeyê her ku diçe xerab dibe. Ji ber vê Erdogan mecbûr ma û got ku kesên ku di destê xwe de dolar û euroyê digirin jî terorîst e. Tenê ev axaftina Erdogan asta xetere û krîza aborî ya dewletaTirkiyeyê tê de ye radixe ber çavan. Ne tenê civaka feqîr û kesên betal, sermayeya Tirkiyeyê jî ji rewşa aboriya Tirkiyeyê ku îro tê de ye ne razî ye. Rojane nerazîbûn û hişyariyên xwe tîne ziman.

***

Rewşa li Tirkiyê wisa naçe. Di siyaset û dîplomasiya navneteweyî de taybet li Rojhilata Navîn xitimiye û her ku gavan diavêje hîn bêtir dikeve nava çiravê. Her roj ji xwe re dijmin peyda kirin, bi demagojiyê bi hestên civaka Tirkiyeyê lîstin, ne mimkûn e ku di siyasetê de AKP û Erdogan mayînde bike.


***

Rewşa li Tirkiyeyê wisa naçe. Gelên li Tirkiyeyê di warê civakî de ji ber zilm, zext û zordariya dîktatoriya Erdogan û desthilatdariya AKP'ê ketiye nava cendereyekê û her tê guvaştin.

***

Rewşa li Tirkiyeyê ew ê wisa neçe, lê ji bo vê jî tiştek pêwîst e. Hemû kes, civak û çandên li dijî dîktatoriya Erdogan û faşîzma AKP'ê pêwîst e li hemberî dîrokê, pêvajo û nifşên nû xwe berpirsyar bibînin. Ji bo vê jî hinekî din xwedî cesaret, hinekî din xwedî helwest û xwebawerî pêwîst e. Pir tişt, heta her tişt bi helwest û têkoşîna ew kes û civaka li dijî faşîzmê ve girêdayî ye. Eniya li dijî faşîzmê xwe hîn bi cesaret bi rêxistin bike demoktartîkbûna Tirkiyeyê û çareserkirina pirsgirêka kurd mimkûn e. Jixwe sedema hemû pirsgirêkan jî hebûna pirsgirêka kurd û demokratiknebûna Tirkiyeyê ye.


www.arsivakurdi.org




# Şopdarê heqîqetê: OSMAN ÇAPAN

Rojnamevan Osman Çapan ku bi kamera û mîkrofona xwe ji Kobanê heta hemû navendên xwerêveberiyê çû gelek çeperên berxwedanê û rastiya li van cihan ji raya giştî re ragihand, li çiyayên azad ku yek ji van çeperên berxwedanê ye, jiyana xwe ji dest da.

Osman Çapan ji Kobanê heta Botanê li erdnîgariya Kurdistanê, bi kamera û mîkrofona xwe rastî ji raya giştî re ragihand. Herî dawî berê xwe da qadên azad û tev li nava têkoşîna azadiyê bû. Çapan li vê derê jî jiyana xwe ji dest da.







*Rojnameger Osman Çapan bi armanca **ragihandina rastiya gelê xwe li her devera Kurdistanê tê koşiya. Di dawiyê de jî li çiyayên Kurdistanê şehîd bû***

### XEYALA ÇAPAN

Osman Çapan di sala 1993'yan de li gundê Xincika yê Farqîna Amedê ji dayik bû. Zarokatiya xwe li gundê xwe derbas kir. Di zarokatiya xwe de her tim digot 'Ez ê bibim rojnamevanek'. Piştî ku li Farqînê lîse qedand, di sala 2013'an de beşa li gorî dilê xwe Beşa Rojnamevaniyê ya Zanîngeha Akdenîzê ya Antalyayê qezenc kir.

### ZANÎNGEH BERDA

Çapan ê di nava civakeke welatparêz de mezin bû, li zanîngehê yekser dest bi karê ciwanan kir. Zanîngeh ji bo pêşvebirina xwe wek firsendekê dît. Bi têgihîştina, ku sîstema perwerdeyê ya heyî tiştekî nade wî, di pola yekemîn a zanîngehê de rahişt kameraya xwe, li Kurdistanê vegeriya û dest bi rojnamevaniyê kir.

### RÊWÎTIYA DAWÎN

Çapan bi nûçeyên xwe, xebatên ciwanan ên li Amedê ji raya giştî re ragihandin. Dema DAIŞ'ê êrîşî Kobanê kir, ew jî derbasî Kobanê bû û bi dîmen û wêneyên li vê derê kişandin, rewş radigihand.

Piştî ku Kobanê bi temamî ji çeteyên DAIŞ'ê hate paqijkirin, Çapan vegeriya bakurê Kurdistanê û êdî li bajarên bakurê Kurdistanê di nava şert û mercên şer ên 24'ê tîrmeha 2015'an dest bi rojnamevaniyê kir. Piştî ku xwerêveberî hat ragihandin, wî jî li pişt bendan dest bi ragihandina berxwedana xwerêveberiyê kir. Çapan şahidî ji berxwedanên dîrokî yên li Cizîr, Silopiya, Nisêbîn, Gever, Sûr, Şirnex, Hezex û Farqînê re kir. Di televîzyona Stêrk TV de bi bernameya bi navê 'Ronahiya Ciwan' hewl da vê berxwedanê nîşanî tevahiya cîhanê bide.

### RASTÎ DIŞOPAND

Çapan bi ked û fedakariyeke mezin li pişt bendên berxwedanê rojnamevaniya xwe dewam kir û gelek caran bû hedefa zexta giran a polîsan.

Di 5'ê îlona 2015'an de li Nisêbînê bi saetan di bin çavan de hat girtin. Piştî ku hat berdan, polîsan gefa 'Dev ji rojnamevaniyê berde, vî bajarî biterikîne' lê xwar. Çapan guh neda van gefan û xetereya mirinê, lewma dest ji karê xwe berneda û bi mehan xebitî.

### KESEKÎ RÛKEN BÛ

Çapan hê di zarokatiya xwe de bi taybetmendiya xwe ya qanihkirinê dihat naskirin. Ev taybetmendiya xwe di karê xwe yê rojnamevaniyê de gelekî baş nîşan da. Di ekranên televîzyonê de bi rûkeniya xwe cihê xwe di dil û hişê temaşevanan de girt.

### ÇAPAN ŞEHÎD BÛ

Çapan piştî ku ji qadên xwerêveberiyê derket, bi kameraya xwe berê xwe da qadeke din a berxwedanê; çiyayên azad ên Kurdistanê.

Li vê derê navê hevalê xwe yê li qada xwerêveberiyê jiyana xwe ji dest da Êrîş Botan li xwe kir.

Çapan li vir jî bi erk û berpirsyariya xwe ya rojnamevaniyê rabû.

Di 13'ê mijdara 2016'an de ji ber bombedûmana bi balafirên şer û gulereşandina ji maşîneyên zirxî yên bi tîpa kobra, li bejahiya Licê jiyana xwe ji dest da.

### HEVALTIYA MÎNAK

Bav Mehmet Şîrîn Çapan destnîşan kir ku kurê wî xwedî kesayeteke cuda bû û ev tişt anî ziman: "Şaşiyên xwe qet venedişartin. Yekser dihat ji min re digot û rexnedayîna xwe dida. Bi mirovên ji her temenî re hevaltî dikir. Bi zarokan re dibû zarok, bi kal û pîran re jî dibû kal. Bi rûkeniya xwe her kes îqna dikir. Çavên me hê li rêya wî ne. Armanca kurê min azadiya Kurdistanê û avakirina jiyaneke azad bû. Em ê heta dawiya emrê xwe bi bîranîna wî bijîn."


### BÎRANIÎNA DAYIKÊ

Dayik Gulluşah Çapan jî diyar kir ku kurê wê ji mirovan hez dikir û wiha got: "Bi taybetî gelekî ji min hez dikir. Gelekî bi min ve dilsoz bû. Her tim ji min re digot 'Dayê te ji ber min gelekî zehmetî kişand lê dibe ku tu zehmetiyên mezintir bikişînî'. Bi vê gotina xwe hewl dida bibêje ku wê rojekê bikeve ser vê rêyê. Her tim ji bo min behsa qala zextên li kurdan dihatin kirin, dikir. Kurê min ji ber rojnamevantiyê timî diçû bi gel re diaxivî. Carinan ji min re digot, hin dayik nedikarîn ji kamerayê re biaxivin. Her tim got, 'Ger rojekê yek hat xwest bi te re hevpeyvînê bike, hingî baş biaxive." ***AMED - ANF***

---

**Neqeb**

# Parrhesia



Ulaş Guldîken

Ev peyva bi yewnaniya kevn di wateya 'rast gotin, rast axaftinê' de ye. Gotina rast an jî axaftina rast her daîm di nav pîvanên zimên de pêkan e. Çimkî li gorî peyvsazî û hesabên lipeyhevanîna peyvan, her axaftin dibe ku gotina rast be. Gava hiş û aqil bixebite zagonên zimên ên teşeyî rê didin zimên ku rast bilebite. Lê rast gotin, aşkerakirinê, vekirinê dixwaze. Ew ne bi awayên şêweyî di heman demê de di wateya heqîqetê de jî rastiyê dixwaze. Wê demê tişta ku hatiye ziman ji baweriya kesan, ji baweriya bi wê rastiyê wêdetir ew tişt ji ber rastiya xwe bûye rastî ku tê der.

Rast gotiniya ku li vir ji me re dibe mijar, li ser gotinên ku hatine qedexekirin, sergirtî û hatine şêlûkirin û hwd. in. Lewma gava ev dibin mijar, kes bi deranîna van ji gelek aliyan ve divê têkildarî hinek tiştan be. Ev rastî ne tenê agahî û zanîn in ku kes bi wan re di têkiliyên kesane de dijîn. Ev şêweyên rastiyan bi xwe re pirs û kêşeyên etîk, estetîk, exlaqê naynin. Gava ev hemû bi yek alî bi ser kesan de hat, li wir em êdî bi kesekî/e ku rastiyê ji xwe re dike derd re rû bi rû ne.

Li vê derê dîsa bi peyva jorîn ve girêdayî parrhesiastes ji bo keseke/î ku rastiyê dibêje tê gotin. Ev kes, ji bo ku rastî were gotin li şert û mercan mêze nake. Di çi rewşê de be bila bibe ew çavê xwe ji gotinê nakute. Ji xwe gava her kes karibe rastiyê bîne zimên û biaxive pêdivî bi wî kesî/ê namîne. Ango ew êdî kesek ku em wî/ê bi awayekî ji dûr/nêz bi tiliyan nîşan didin nîn e.

Ji bo ev derfet hebe demokrasiyeke rasteqîn ne hewce ye. Jixwe tiştek wisa wek şert li pêş me be jî dê tu wateya rastgotinê dernekeve. Li cihekî ku demokrasiyek temambûyî hebe jixwe li wir em li kesekî/e ku rast diaxive jî nagerin. Li wir pêdivî ne bi aşkerakirina tiştekî dizî ne jî bi tiştekî ku kes nikare cirheta anîna wê ya zimên nîşan bide namîne. Ji bo wateya rast gotinê hebe divê rîskek an jî xetereyek hebe ku ev kes dide ber çavan û li pey wê diçe.

Xaleke din, ev rastgotinî divê bi xwe re ferqekê derxe ku beriya gotinê û piştî gotinê li ser kar be. Bi vê re ji nava ferqa statûya kesê/a xwediyê gotinê û muhatabê wî/ê, derfeta rexnê derkeve ku ji xwe re wek rikek etîk hilgirtiye. Li vir him têkiliya wî/ê ya bi heqîqetê re him bi ya azadiyê re bi awayekî çalak di meriyetê de ye ku êdî jiyana wî/ê jî eleqedar dike.

Pirseke din, kî dikare di warê heqîqetê de biaxive? Her kes li wê warqiliye yan ev dibe para hinek kesan tenê? Gelo ji bo vê dixwaze civakî dixwaze polîtîk an jî saziyane zagonek heye ku teqez li ser wî ferz bibe ku hatibe mîsogerkirin? Ji jiyanê û têkiliya mirovan a bi xwe û derveyî xwe ya takekesî tê zanîn ku kesek ji bo bilêvkirina agahiyekê zorê nade tu kesî. Lewma tu kes xwe di vî warî de erkdar nabîne û kesek jî ji ber vê nikare wî tewanbar bike ku agahiyan bi kesên din re parve nake. An jî mafê tu kesî tune ye ku ji wî/ê kesê/a xwedî agahî ye re bibêje tu çima vê agahiyê naynî ziman. Ev kes encax vê meselê wek karekî jiyanî û etîk bibîne û dema ku ji xwe re bike derd wî/ê eleqedar dike.

Rastgotinî wê demê wî/ê kesî/ê wek mirovekî/e polîtîk li hemberî desthilatdar, rayedar û kesên qatên bilind; wek mirovekî/e etîk tev digere ku bi jiyana xwe bi heqîqetê re têkildar bi rast axaftinê muxatab digire.

## Pêşbirk bi temaya 'Jinên Penaber' dest pê dike

**WEQFA SABANCI** dê îsal pişbirka kurtefîlman pêk bîne. Pêşbirka bi temaya 'Jinên Penaber' dest pê dike, tê payîn ku gelek kurtefîlm tê de bên pêşandan. Pêşbirka bi navê 'Fîlmê Kurt, Bandora Zêde' tê lidarxistin, dê cara yekemîn temaya pêşbirka ji aliyê vê weqfê ve bê lidarxistin. Weqf bi pêşbirka 'Jinên Penaber' dixwaze ku nêrîna li hemberî sînemayê bê guhertin û cudabûnek di warê fîlmçêkirinê de derkeve pêş. Ji bo projeyê ji van navnîşanan agahî dikare bê wergirtin: facebook.com/kisafilmplatformu, twitter.com/kisafilmplat, instagram.com/kisafilmplatformu. **STENBOL**




# Zilm hebe dê berxwedan jî hebe

Nivîskar Nevîn Bektaş jî wekî bi hezaran mirovan di darbeya 12'ê Îlonê de rastî îşkenceyên giran hat. 22 salan di girtîgehê de ma. Li girtîgehê pirtûkên xwe yên 'Hucre' û 'Darbe, Têkçûn, Berxwedan:12'ê Îlonê' nivîsîn û piştî ji girtîgehê derket, ji ber pirtûka xwe ya 'Hucreler' 11 meh cezayê girtîgehê lê hat birîn. Bektaş di 2010'an de dîsa hat girtin, piştî 5 mehan hat berdan.




***Nivîskar Nevîn Bektaş ku bi pirtûkên xwe yên 'Hucre' û 'Darbe, Têkçûn, Berxwedan:12'ê Îlonê' tev li 10'emîn Fûara Pirtûkan a Çukurovayê bû, aşkera kir ku li cihekî zilm hebe dê berxwedan jî berdewam bike***

Bektaş tev li 10'emîn Fûara Pirtûkan a Çukurovayê bû û der barê jiyan û pirtûkên xwe de axivî. Bektaş diyar kir ku bi taybetî ciwan eleqeyeke mezin nîşanî pirtûkên wê didin û wiha axivî: "Min îşkenceyên cuntaya 12'ê Îlonê û berxwedana li dijî vê di pirtûkên xwe de nivîsî. Pirtûka Hucreler min beriya komkuijya mezin ya 19'ê Qanûnê nivîsî."

Bektaş der bare pirtûka xwe de jî axivî û ev tişt anî ziman: "Min ev pirtûka xwe jî di dema ku AKP'ê digot wê 12'ê Îlonê bê darizandin de nivîsî. Doza 12'ê Îlonê tenê li ber çavan hebû. Ev pêvajoyek bû ku AKP'ê propagandaya xwe dikir."

Bektaş anî ziman ku tevî ku ew qas sal derbas bûn jî li welat tiştek neguheriye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Wek duh îro jî destûrê nadin azadiyan. Duh OHAL hebû îro jî heye. Pirtûk dihatin berhevkirin, îro jî tên berhevkirin. Girtin û binçavkirin îro jî hene."

Bektaş herî dawî da zanîn ku her ku zilm zêde bibe, berxwedan jî zêde dibe û axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Ez vê ji 12'ê Îlonê dizanim. Ez ji xwe dizanim. Em nivîskar û rojnameger dê her tim rastiyan binivîsin." ***EDENE - ŞÛJIN***

# Alphorn û qîrîna ku ji darê tê



Gelên bi sedan salan li çiyayên Alpê yên Swîsreyê jiyana xwe berdewam dikin, amûreke ku tu amûr naşibinê, bi kar tinîn. Navê vê amûrê 'alphorn' e. Ev amûr dibe ku ji bo ragihandinê ne amûreke hêsan be, hin alphorn ew qas dirêj in ku gelekî ji bejna kesên ku lê dixin jî dirêjtir in. Lê dîsa jî alphorn bi destan tê gerandin. Hin cureyên wan hene ku ji hev derdikevin û dikevin qutiya wê ya taybet jî. Dengê vê amûrê ew qas zêde ye ku li çiyayên Alpê ji 10 kîlometreyan jî tê bihîstin.

**ÇÊKIRINA WÊ**

Alphorn ji dara ladînê çêdibe û ev dar li çiyayên Alpê yên Swîsreyê hêşîn dibin. Ji ber şertên hewayê, darên ladînê di geliyên tîk de çêdibin û piştî ku dirêj dibin, di kokê de xwar dibin.

Hostayê alphornê destpêkê darekê hildibijêre. Piştre bi baldarî wê terk dike û dike du tebeqe, nava wê vala dike. Tenê ev kar 80 saetan diajo! Piştre bi êgeyan nava darê tê şimşatkirin û zimparakirin. Piştre ev her du tebeqe bi hev ve tên zeliqandin û bi lîfên darê bi xweşikî dipêçin. Her wiha bi textikan jê re lingek tê çêkirin, bi vî şêwazî dema li alphornê tê xistin deng jê derdikeve. Piştî van hemû karan, jê re devik tê çêkirin û li cihê ku deng jê derdikeve,



tê neqişandin. Herî dawî ji bo ku avê negire, tê wernîkkirin.

**ŞIVANAN LÊ DIDA**

Şivanên ku li çiyayan sewalên xwe diçêrandin, ji bo kesên li deştê wan bibîhizin û bixwaze tiştekî ji wan re ragihîne, bi salan alphorn bi kar anîn û peyamên xwe şandin. Lê ev amûr herî zêde ji bo welatî bên çêlekên xwe bidoşin, hatiye bikaranîn. Dema zivistanê gavan çêlekan dibin axûrê, kesên li alphornê didan peyayî kuçeyan dibin. Bi vê rêyê pere qezenc dikirin. Her wiha di demên berê de jî bo mêran bibin şer, bi alphornê bangî wan dikirin.

**ÇAWA TÊ LÊXISTIN**

Ji ber ku nota û kunên wê tune ne, dibe lêxistina alphornê hêsan bê xuyakirin. Lê ya esas divê li gorî wê bêhn bê derxistin û deng jê bê derxistin. Alphorn di oktavên cuda de tenê 12 notayên bingehîn derdixe. Di vê amûrê de hûn nikarin her newayê derxin. Dîsa jî muzîkjenek bixwaze straneke ji bo vê amûrê hatiye derxistin lêxe, divê gelekî jêhatî be.

Muzîkjenên navdar, stranên ji bo orkestrayê nivîsîne, ji bo ku dengê alphornê derxin hin sererastkirin kirine. Wek mînak bestekarê navdar ê bavê Mozart, Leopold Mozart, di berhema xwe ya bi navê 'Sinfonia Pastorella' de, dema li gorî orkestrayê sererast dike, cih dide corno pastorito ya dişibe alphornê jî. Brahms jî ji bo dengekî nêzê alphornê derxe, flût û korno bi kar anîne.

Cara yekemîn navê alphornê di lênûska keşîşxaneya St. Urbanê ya Swîsreyê de, di sala 1527'an de hatiye qeydkirin. Her çendî di navberê re 500 sal zêdetir dem derbas bûbe jî hêj dengê alphornê li çiyayên Alpê olan dide.

## FÎLMÊN VÊ HEFTEYÊ — dikevin vîzyonê

**Queen Of Katwe**



Fîlmê Queen Of Ketwe ji çîrokeke rast hatiye wergirtin û li ser jiyana jineke ciwan a ugandayî radiweste. Jina ciwan piştî kişikê hîn dibe di jiyana wê de çi guhertin pêk tên û ev yek di fîlm de derdikeve pêş. Phionaya 10 salî û malbata xwe li şevnîşîneke li Katwe ya Wargeheke Ugandayê dijîn û têkoşîneke wan a jiyanê ya bibandor heye. Piştî Phiona ji propagandaya mîsyoneriyê ya Robert Katende re şahidiyê dike, cîhana wê bi tevahî diguhere.

**American Honey**



Di derhêner û senaryoya fîlmê 'American Honey' de Andrea Arnold cih digire. Star a ku ji jiyana feqîrî û belengaziyê gelekî aciz bûye, di carekî de Jack derdikeve pêşberî wê û dibe evîndarê wî. Jack pêşengê komeke firoşkarên kovaran e û Starê jî dikişîne nava vê jiyanê. Star ji ber şertên jiyanê, diçe gel Jack û dê bi kîjan pirsgirêkan re rû bi rû bîmîne, ne diyar e.

**Sî**




Fîlmê 'Golge' (Sî) balê dikişîne ser jiyana Tarik û Gulayê. Tarik di ajanseke mutevazî ya reklam û mankenan de edîtoriyê dike, hevjîna wî Gulay piştî salên dûr û dirêj zanîngehê diqedîne, li gorî branşa xwe karekî dibîne, lê Gulay tengasiya ruhî dikişîne. Piştî Gulan krîza hêrsê derbas dike, jiyan li her du hevjînan diguhere. Fîlm li ser jiyana van her du mirovan radiweste.

**Hep Yek 2**




Fîlmê 'Hep Yek 2' di cihê mayî de berdewam dike. Gurkan (Gokhan Yikilkan) û Altan (Înan Ulaş Torun), ketine destê Cevat Bakir (Gurkan Uygun). Di fîlmê yekemîn de ji ber ku Şahîn Cevat Bakir dixapîne, ji hêla wî ve tê kuştin, Altan û Gurkan hevkarên sûc ên Şahîn in û ji bo ku cenazeyê Şahîn ji holê rakin wan dibexşîne. Di vê fîlm de jî serê her du kesan ji belayê nafilite.

**Jiyana Kabakçik**



Dibe navekî lêkirî yê wek Kabakcik ji bo zarokekî kur gelekî ecêb be, lê ya rast çîroka wî ya şênber bi awayekî ecêbmayî gerdûnî ye. Piştî ji nişkê ve dayika Kabakçik wefat dike, ew jî hêla polîsê bi navê Raymond ve teslîmî saziya zarokên sêwî tê kirin. Kabakçik destpêkê di vê saziyê de ji bo ku ji xwe re cihekî bibîne, gelekî zehmetiyan dikişîne, lê bi alîkariya Raymond, ew hêdî hêdî bi dîtina hevalên nû, bi demê re bawerî, hezkirina rast û li gorî xwe malbatekî dibîne.

# KRÎZ BI MUXALEFETÊKO ORTAX ÇARESER BENO

SELMAN GOZELYUZ-DENÎZ NAZLIM / ENQERE - DÎHABER

*Nika Tirkîya de hetê ekonomî û sîyasî de krîzêko gird yeno cuyayîş. Teşebusê derbe ra dima OHAL ame îlankerdiş û her hetan ser de hêrişî virazîyayî. Nika zî hukmatê AKPyî seba ke Sîstemê Serekî bêro Tirkîya, Meclîs de pêvînayîş û reydayîşê nê sîstemî virazeno. Hetê ekonomîye de her roje Dolar û Euro resenî vayêko rekor û duştê ci de hêzê herînayîşî yê merdiman keweno.*

*Akademîsyen û nuştox Fîkret Başkayayî derheqê rewşa Tirkîya ya peyên ke krîzê sîyasî û ekonomîk de qisey kerd.*



Akademîsyen û nuştox Fîkret Başkayayî dîyar kerd ke Tirkîya kaosêko gird reyde rî bi rî menda û wina va: **“Labelê tena muxalefetêko ortax yê ke tevgerê sîyasî yê kurd zî tede nê kaosî ra rizgar biba”**

**✪ Tirkîya prosesêko krîtîk ra derbaz bena. Pêvînayîşê qanûno bingeyî, lej û sewbîna. Tirkîya beşdarê şerê Rojhelato Mîyanên zî bî. Se beno, çi qewimîyeno? Ti nêyî senî vînenî?**

Xora sîstemê kapîtalîst yê dinya kewto mîyanê xetimîyayîşêk û ma krîzê şaristanî reyde rî bi rî yî. Êdî kapîtalîzm çareserî ra zêde probleman virazeno. Viraştişî ra zêde rijneno. Hetê pêroyî de fotografêko winasî esto; yanî sîstem de krîzêk esto. Nê semedî ra no krîz û xetimîyayîş Tirkîya de hîna wişk o. No fotograf wina yo: êdî no rejîm bi demokratîkbîyayîşêko seqet de nêeşkeno rayîr şêro. O wext tena çîyêk destê înan de maneno, o zî manîpulekerdişê şîddetî yo. Wazenî heqanê merdiman tasfîye bikerî û nêyî zî bi rejîmêko newe ferz kenî.

**✪ Gelo no qanûno bingeyî yê 82 ra hîna tepîya yo?**

Madem kî nêeşkenî îdare bikerî o wext qanûno bingeyî yê Kenan Evrenî daxî înan rê zêde yeno. No qanûno bingeyî xo ra qanûno bingeyî yê rewşa taybetî bî. No zî înan rê zêde yo û o wext se beno; sereyê înan de agêrayîşê xîlafet û awankerdişê padîşahî esto. Cok ra çiqas qezencê modernîteyî bibî, heme, hetê înan ra yenî tasfîyekerdiş.

**✪ Serranê verênan ra heta ameyîşê proseso ewroyên de berpirsîyarîya CHPyî çi yo?**

2 sebebê muhîmî estî ke bîyî sebebê tabloyêka winasî. Ya yewine hîna zaf sebebê ekonomîk o. 24ê çile 1980 nuqtaya krîtîk bî û derbeya 12ê êlule derbeyêka Amerîka ya. O wext se kerdî; verê xo dayî teber, bi ekonomîya dinya reyde bîyî yewe, ekonomîya xo goreyê ekonomîya pîyasa eyar kerdî.

Ya dîyine 1960 ra nata vernîya kehenperestan abî. Serranê 60î de Tirkîya de tevgerê çepan û tevgerê kurd vejîyayî orte. O wext Tirkîya de sinifê ke wayîrê mal û milkî bî goşanê xo padayî û dewlete zî vernîya kehenperestan akerde. Na polîtîkayêka dewlete ya sîstematîk a. No tena tercîhê dewlete bi xo zî nêbî, waştişê Amerîka û NATO bî. Înan seba ke hem vernîya sîstemê Sovyetî û hem zî Tirkîya de vernîya kesê averşîyaye bigirî, zereyê Tirkîya de piştî dayî kehenperestan. Nika vanî no FETO senî kewto mîyanê dewlete? Henekê xo bi merdiman kenî. Tercîhêk na dewlete estbî o zî dînperestkerdişê erkanê dewlete bî.

**✪ Şima teşebusê derbe ke nêresa hedefê xo senî vînenî?**

Goreyê mi yê ke teşebusê derbe kerdî û yê ke hesaban ra vernîya derbe girewt, hedefê înan yew o. Cok ra yê ke vernîya derbe girewt, cayo ke derbekaran verda, ewja ra dewam kenî. Derbe hîna zî dewam kena. Wina kerdî ke 15ê temuze açarnayî firsendêk. Îlankerdişê OHALî zî nêyî nîşan dano. Veradê dewleta huqûqî, Tirkîya de Qya qanûnî çin a.

**✪ Eke şima verê û ewro ronî têhet, çi vejîyeno orte?**

Wexto ke ez tede cuyaya qet wina nêbî. Ci ra 20-30 serrî verê zî çîyêko winasî çinêbî. Tarîxê Tirkîya de çîyêko sifteyîn o. Wexto ke qanûn û quralêko şenik daxî tede çin o yo. Pîvanê erjî nêmendî, etîk û ehlaq qet nêmendo. Heta nika qet wina nêbîbî. Etîk yeno manaya sînorî. Yanî potansîyelê çîyo ke bêro kerdişî ra remayîş o.

**✪ Şima nê çîyê ke yenî cuyayîş senî şinase kenî?**

Kaos mefhûmêko ke faşîzmî ra hîna hîrayêr o. Seba ke Tirkîya rewşêka nêeşkena bêra îdarekerdiş de ya, ez wina vana. Heme şewqê nîşaneyî sûr yan zî zerd î. Şima zî zanî zerd zaf nêvindeno, derbazê sûrî beno. Cok ra heme warê komelî de tabloya iflasî esta. Yê ke nêyî ra vanî faşîzm esto, tayê zî sey kaosî şinase kenî. Reyna rejîmê şîddetî zî esto.

**✪ Gelo sebebê proseso ke ti sey kaosî şinase kenî, çi yî?**

Xora tîya de problemê kurdî esta. No rejîm hetê çaresernêkerdişê problemê kurdan de sond werdo. Labelê xusûsîyetêk nê rejîmî esto ke ti waştişo ke hetê şarî ra bêro rê cewabêko baş nêdayo û nêdano zî. Eke wina bibo o wext vano qey do efsûnê ci xira bibo. Nê semedî ra heta ke kurdî nê hetî de talebê înan bibî, her tim nê waştişê kurdan ameyî taloqkerdiş û heta roja ma ya ewroyin ameyî.

**✪ Do heta kura bidomîyo?**

Bêhêvîtî çîyêko her tim bibo, nîyo. Çimkî tebîetê merdimî de wina nêbeno. Labelê wextê ke omidê merdimî zeyîf benî, estî. Îxtîmal esto ke rewşe hîna xirabin biba; mesela rewşa ekonomî zaf xirab a. Eke 10 mîlyon merdimê bêkar estî, na hûmare do bivejîya 20 mîlyonî. Keso ke bi zorî nan girewtêne, do êdî nêşînbo nan zî bigiro. Teberê rojnameyanê dewlete de do ti rojname nêro dayîş. Ez nêeşkena bivaja ke şero mîyanên do nêvejîyo. Nika ra Tirkîya welatê Rojhelato Mîyanên manena.

**EKE BIWAZÎ EŞKENÎ BIBEDILNÎ**

**✪ Goreyê to pozîsyonê muxalefetî û rayîrê krîz ra vejîyayîşî çi yo?**

Xeylê kesî nê şîyayîşî ra zirar vînenî. Raştîya xo de sera 99 yê şarî nêyî ra zirar vînenî. Îxtîmal esto ke nê hetê ke zirar vînenî bikewî mîyanê têgerayîşî. Modelê nêyî do senî bibo, ez nêeşkena çîyêk vaja, labelê eke biwazî eşkenî nêyî bibedilnî. Dîreksîyonê nê wesayîtî eşkîyeno bitadîyo hetê çepî ra.

**✪ Gelo muxalefetêko ortax mumkun o?**

Muxalefetê kurdan esto û dînamîkêko muhîm o. Reyna muxalefetêko hîra yê laîkan esto. Wexto ke merdim nînan hemînan ano têhet, o wext vîneno ke potansîyelêko gird ya xirakerdişê nê kayî esto. Potansîyel esto, la kewtişê pratîkî çîyêko cîya yo.

**✪ Goreyê to CHP bi pozîsyonê xo yê nikayîn eşkeno mîyanê muxalefetî de ca bigiro?**

Ganî CHP tede ca bigiro, çimkî sewbîna şansê ci çin o. Mesela CHP meclîs de muxalefet keno labelê hetê problemê kurdan de nêeşkeno muxalefet bikero. Ewja de problemêk û zeyîfîyêk esto. Eke nê zeyîfî ra rizgar bibo, o wext muxalefetê kurdan, CHP, muxalefetê laîkan, muxalefetê çepî eşkenî bêrî têhet. O wext problem kura de yo? Problem zanayîş û yê rêxistinbîyayîş de yo.

**✪ Derheqê qanûno bingeyî de zaf spekulasyonî estî. Goreyê to do meclîs ra derbaz bibo an nê, eke derbaz bibo do referandum senî bibo?**

Nêyî wazenî wextêko kilm de reydayîşê qanûno bingeyî biqedênî. Her çiqas ke wina aseno ke derbaz bibo, reyna zî îxtîmalê derbaznêbîyayîşî zî esto. Eke şêro referandum, îxtîmal esto ke nêro qebulkerdiş.

**✪ Eke referandum de nêro qebulkerdiş, Cepheyo ke vano ‘ya’ do sey peynîya weçînayîşê 7ê Hezîrane israr bikero?**

Eke referandum de nêro qebulkerdiş, o wext zî muhîm o. O wext se beno, do merdimî razî bibî? No qanûno bingeyî derbaz bibo, xora seba komelî çîyêko şermî yo. No qanûno bingeyî qanûno bingeyî yê Abdulhamîto 2. ra zî xirabêr o. Seba çi hende lez keno? Çimkî krîzê ekonomîk nizdî yo. Deynê welatî her ke şono zafêr zî beno. Wazenî heta ke krîzê ekonomîk nêteqeyo qanûno bingeyî derbaz bikerî. Eke nêyî rê destûr nêro dayîş, komel nê nîzamkerdişî yewna rey qebul nêkeno.

## Tarîx de tesilî peyserşîyayîş çin o

**✪ Pêvînayîşê qanûno bingeyî kurayê nêyî de ca gêno?**

Xusûsîyetêko bedilnayîşê qanûno bingeyî esto. No sey yê verênan nîyo. No, viraştişê qanûno bingeyî nîyo, orte ra wedarnayîşê qanûno bingeyî yo. Tena parçeyê ci yê tîya nê, xusûsîyetê îslamkarê sîyasalî no yo ke dişmenê erjê gerdunî yî. O wext tena wextê 1923î nêkenî problem, derdê înan tena hende nîyo. Wextê verên reyde zî problemê înan esto. Nîyetê înan esto ke ver bi Kanûnî Esasî yo 1. û heta seserra 7. şêrî. Labelê çîyo ke hesab nêkenî esto, o zî tarîx de tesilî peyser agêrayîş çin o. Ti eşkenî zor bidî, bişidêne û ser de zextan bikerî, la peyser agêrayîş nêbeno. Tîya ra çîyêk nêvejîyeno. Labelê potansîyelê înan esto ke zirar bidî komel û merdiman.

---

## Vengêkoy

# Armancê raştîn yê ardişê qayûman


Nêsrîn Navdar

Mîyanê serra 2016 de û verdewamê na serra neweyî de yeno dîtişî ke hikûmatê AKP û serekkomarê ey bi qerarê ke bi heme awayî ciwiyanê şarê kurdî dagîr bikerê û înan ser de desthilatîya xo ronê.

****

Dimayo ke keyeyê şarê ma hetê na pergale ra ameyî xirakerdişî û ciwan, tût (gede) û cinî bi awayêke teberê merdimahî de ameyî qetilkerdişî, dimayo ke pay ro kede şarê ma amî kerdişî û karê înan dest ra ame girotişî, dimayo ke heme sazî û dezgehê şarê ma ameyî qefelnayîşî û rayveberê ma yê weçînayey ameyî hepskerdişî û qeybo ke nê kerdişanê xo yê nemerdî û nemerdimahî bilimnê çapemenîya şarê ma amî qefelnayîşî nika zî bi qeyûmanê xo û heme awayî derfetanê dewlete desthilatîya xo şarê ma ser de verdewam kena.

****

Ma banîrê kerdişanê qayûman tenê ra zî bes o semedo ke ma waştişê nê hikûmatî yê kurdan ser de fam bikerê. Vernîya heme çî de bi awayêke bêhiqûqî û bê ke îradeyê şarê ma bêro hesabkerdişî bi tayînkerdiş û dagirkerdişî şaredarîyê ma hetê qayûman ra ameyî degirotişî. Dimayo ke qayûman şaredarîyê ma dagîr kerdî, karê înan o yewin raste ra wedartişê xebat û nûşteyanê bi ziwanê kurdî bi ke di çarçiwaya zehfziwanî de ameybî kerdişî. Dima ra goreyê waştişê xo ra kar ra eştişê bi seyan karker, karmend û xebatkaran û ey ê ke mendê zî bedelnayîşê cayê înan bi.

****

La mîyanê heme kerdişanê înan de o yo ke merdimî rê ecêb yeno vernîya Şaredarîya Şaristanê Girdî ya Amedî ra wedartişê peykeranê şêran ke yew mîtolojîya kurdan ra yenê bi. Xora raste ra wedartişê peykero ke semedê vîrardişê Roboskî Parka Rojava de amebî ronayîşî nizdahî û psîkolojîya înan a şarê ma ser de baş ra mojneno. Heme şarê ma trajedîya Qirkerdişê Roboskî zanê. Bedenê ciwan û tûtê kurdan ê perçekerdey û qîrîne dayanê înan. Destê dayanê înan ê ke ver bi ezman akerdeybî zî yenê ma vîr û zewtê ke dayênê kiştoxanê ewladanê xo ro zî.

****

Bi wedartişê peykerê Roboskî û peykerê şêranê verê şaredarî desthilatan di hetan ra armancê xo moşt ra. Ê yewine wazenê şarê ma qirkerdişanê înan xo vîr ra bero û çimanê xo kerdişanê înan rê bigîro, ê diyîne nêwazenê şarê ma tarîxa xo bîyaro xo vîr yan zî bimûso. Peynîya peynî gama ma awnênê kerdişanê qayûman ra ke mîyanê wextêke kilmî de pêk ardê ma vînenê ke hetê hikûmatî ra armancê raştîn ê ardişê qayûman ne karê şaredarîtî yo.

****

Armancê înan o raştîn qirkerdişê ziwan û tarîxe şarê ma û bêvîrverdayîşê şarê ma yo. Nê ra semed lazim o ke şarê ma hişmendîya xo ya hetê estişê xo yê neteweyî, ziwan û tarîxe xo laver bero û bieşko hesabê qirkerdişan nê hikumdarê desthilatan ra biwazo.

www.arsivakurdi.org

# Wa fek qoricîtî ra verabidî

**Gerîla Hîvda Pîrosîya ke keyeyêko qoricî ra beşdarê PKKyî bîya, veng daye keyeyê xo û heme qoricîyan û wina va: "Eke wijdanê şima esto, ganî şîma fek qoricîtî ra verabidî"**

ZEYNEP NERGÎZ BOTAN / DÎDAR KATO / BEHDÎNAN - ANF



Polîtîkayê ke dewleta tirk serranê 1990 de Kurdistan de meşna ra qezaya Bêşebabî ya Şirnexî zî para xo gêna. Dewleta tirk o wext seba ke şarî vera PKKyî de bikera qoricî, dewan veşnena û yê ke qoricîtî qebul nêkenî zî dana koçkerdiş. Keyeyê gerîlaya YJA Stare Hîvda Pîrosî zî seba ke nêwazenî ca û warê xo biteriknî, qoricîtî qebul kenî.

Gerîlaya YJA Stare Hîvda Pîrosî qisey kerd û veng daye keyeyê xo û heme qoricîyan.

Pîrosîye va 'qoricîtî polîtîkayêka dewlete ya' û qisekerdişê xo wina domnaye: "Qoricîtî bi temamî kayêk a. Eke ma cuya qoricîyan ra biewnî, ma vînenî ke qoricîyî çiqas bi hawayo nêzan cuyenî. Maya mi û pîyê mi qoricî bîy. Tewr zaf ez eşkena nêyî fam bikera. Çimkî ez mîyanê keyeyêko winasî de cuyaya. Tayê qoricîyî nêzanî ke seba çi sîleh kirişenî. Nêyî ra tena menfîetêk yê înan esto û o zî maaşê înan o. Eke bizanayênê xo ra vera şarê xo de ê sîlehî nêkiriştênê."

**BENO SEBEBÊ ZEXTAN**

Pîrosîye dewamê qiseykerdişê xo de bale ante texrîbatê ke qoricîtî komel de viraşto û wina va: "Zirarê qoricîtî yê komel ser de zaf gird î. Ciniyî kutiş, zext û qedexebîyayîşê teberî reyde rî bi rî manenê. Çimkî ti îdeolojîyê înan çin o. Tena zanî ke sîleh bigirî vera birayê xo de şer bikerî. Sîleho ke bi nêzanî ameyo girewtiş, demêk ra pey beno sebebê zext û şîddetî. Dewlete zî seba qebulkerdişê qoricîtî şerêko taybet meşnena. Pîyê mi zî vera nê zext û tedayan de mecbûr bî ke qoricîtî qebul bikero."

**CINÎYAN RÊ ŞANSÊK O**

Pîrosî qiseykerdişê xo de va 'pîyê mi raştîya kurdan nêzano, PKKyî nêşinasneno û cok ra cîyayîya zaf çîyan de zî nîyo' û wina dewam kerde: "PKK şarê kurd resna cewherê ci. Tarîx û cuya şarî reyna ganî kerd. Heto bîn ra PKK seba cinîya kurde şansêko gird o. Cinîya kurde xo PKK reyde şinasnaye. PKK cuya mi de zî tesîrêko gird viraşt. Wexto ke mi PKK şinasna hem hetê muhakemekerdişê cuya xo û hem zî hetê muhakemekerdişê keyeyê xo de ez zaf aver şîya. Dima ra mi qerar da ke ez şêra koyan. Koyan de cuye û perwerdeyê ke mi dî bîyî sebeb ke ez hêzê xo bizana."

**BÊRÊ BEŞDAR BIBÊ**

Pîrosî peynîya qiseykerdişê xo de veng daye 'pîyê xo, datê xo û heme qoricîyan ke wa fek qoricîtî ra verabidî' û qiseykerdişê xo wina qedênaye: "Wa fek qoricîtî ra verabidî û bêrî rayîrê raşt. Wa cuyêka bimana bicuyî. Eke tayê wijdanê înan bibo, wa vera birayanê xo de sîleh nêtepişî. Herinda ci de eşkenî cuyêka xizmetê şarê kurdî keno, bicuyî. Eke domanê qoricîyê kurdan wazenî hetê azadî de game bierzî, wa fek qoricîtî ra verabidî. Ez veng dana domanê qoricîyan; bêrê beşdarê PKKyî bibî. Eke şima beşdarê PKK nêbî, o wext şima do cuyêka bêmana bicuyî."

## Ma do wayîrê mîrasê înan bivejyî

**Zelîxa Qehremane (60) emrê xo yê şenik de ameya zewijnayîş û mîyanê şert û mercê zehmetinan de cuya xo derbaz kerda. Zelîxaya ke hêzê xo rêxistine ra girewto, mêrde û 2 domanê xo şerê vera DAIŞî de vînî kerdo.**


**Dayîka Zelîxa Qehremane qala cuyayîşê xo kerde.**

**Dayîke va 'mêrde û domanê mi her tim vatênê ke ê do beşdarê YPGyî bibî' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Her di lajê mi beşdarê YPGyî bîyî. Şerê Kobanê de wexto ke DAIŞ hêriş kerd, lajê mi Mazlum şehîd kewt. Dima ra lajê min o bîn şî sîlehê birayê xo girewt û bi nameyê Mazlumî şer kerd. O zî rayîrê xoverdayîşî de şehîd kewt."**



**EZ DO WAYÎR BIVEJÎYA**

**Dayîke dewamê qiseykerdişê xo de va 'badê ke 2 lajê mi şehîd kewtî, mêrdeyê mi beşdarê YPGyî bî' û qiseykerdişê xo wina qedênaye: "O zî şerê vera çeteyan de şehît kewt. Şehadetê înan ra dima dejê mi zêde bîyî. Ez û her di domanê wesnîya xo, ma Kampê Şehîd Şîlane de cuyenî û debara xo kenî. Heta peynî ma do wayîrê mîrasê înan bivejyî. Ez heme şerwanan rê serkewtiş wazena." KOBANÊ - ŞÛJIN**



## AKP û MHP do vînî bikerî

Hukmatê AKPyî û MHP seba ke Sîstemê Serekî bêro awankerdiş, hewl danî qanûno bingeyî bibedilnî. Nê semedî ra nika Meclîs de reydayîş virazîyeno. Labelê heto bîn ra yeno vatiş ke eke sey weçînayîşê 7ê Hezîrane seba Serekkomar Erdoganî rayîrê Serekî nêabo, o wext îxtîmalê viraştişê weçînayîşêko verwext esto. O wext weçînayîşêko verwext bêro viraştiş, do se bibo?

Babete ser o Koordînatorê Merkezê Cigêrayîşê Rayapêroyî yê Avrasya (AKAM) Kemal Ozkîrazî qisey kerd.

Ozkîrazî va 'weçînayîşo verwext vera parlamenteran de tehdîtêk o' û wina domna: "Nizdîyê 70 parlamenterê ke 1ê teşrîna peyêne de ameyî weçînayîş, hîna tewqîfbîyayîşî heq nêkerdî. Cok ra tersê înan ser de yeno kaykerdiş. Îxtîmal esto ke no bedilîyayîş do meclîs ra derbaz bibo. Çimkî parlamenterî bin tehdîtêko gird de yî."

Ozkîrazî wina va: "Eke weçînayîşo verwext bibo, o wext do reyê AKP û MHPyî pîya, sey reyanê AKPyî yê verênan daxî nêbî. Eke MHP beraj biviyarno zî do bi reyanê AKPyî biviyarno. Weçînayîşêko winasî ra yê ke tewr bikar bivejîyo, CHP yo. Herêma Karadenîz de yê ke hetê laîkî de hesas î, vera Bahçeliyî de bi reaksîyon î. Tayê weçînitoxê CHPyî zî îxtîmal esto ke bivîyarî HDPyî. Tayînan seba ke kaos nêvejîyo, rey dabî AKPyî, dîyî ke çare nîyo." *ANQARA - DÎHABER*

## Ma do qetlîyaman bişopnî

Tirkîya de vernîya qetilkerdişê cinîyan nîno girewtiş. Îdarekarî seba pawitişê cinîyan ti gaman nêerzenî. Cok ra zî qetilkerdişê cinîyan zêde bîyo. Nê cinîyan ra yew zî Şehrîbana 22 serreyî ya.

Şehrîbane 26ê kanûne de keyeyê xo yê ke Rayîrê Îpegî ya Wanî de bî, hetê mêrdeyê xo Esad Dînço ke waştêne fek ey ra verado ra bi sîleh ameybî kiştiş. Qatil badê qetlîyamî ame tewfîqkerdiş.

Qetilkerdişê cinîyan ser o Aktîvîsta Komeleya Cinîyan ya Wanî Songul Ozunvere qisey kerde.







Songule qiseykerdişê xo de va 'qetilkerdişê cinîyan polîtîk û îdeolojîk o' û wina dewam kerde: "Sabiqaya Esad Dînçî bi sucê esrar, pereyo sexte û îstîsmarî ra esta. Senî beno ke merdimêko winasî komel de bi hawayo asan hereket keno. Şehrîbane badê îşkenceyê 7 serran şîye Mudirê Asayîşî û waşt ke fek Esad Dînçî ra verado. Esadî seba ke wayîrê zîhnîyetêko serdest bî, şî eşt keyeyê Şehrîbane ser. Cinîya bêsuc her çiqas ke şibake ra qîraye, reyna zî qatil fek Şehrîbane ra veranêda û îşkenceyê fîzîkî ra dima Şehrîbane çimanê domanan ver de qetil kerd."

**'MA TO RA ECIZ BÎYÎ'**

Songule bale ante heqê xopawitişî û wina va: "Şehrîbane muracatê asayîşî kerde la reyna zî nêameye pawitiş. Qetilkerdişê Dîlek Ozîstere zî sey Şehrîbane bî. Dileke her çend ke muracatê polîsan û heqê pawitişî kerdbî, reyna zî ameybî qetilkediş. Polîsan Dîleke ra vatbî 'eke ma her merdimî rê polîsêk bidî do rewşa Tirkîya senî biba. Şo, êdî ma to ra eciz bîyî'. Ma do qetilkerdişê Şehrîbane bişopnî. Ganî qatilî bi hawayo giran bêrî cezakerdiş." *WAN - ŞÛJIN*

## Wazenî mergan meşrû bikerî

Tirkîya de hende qezayê karî ver karkerî mirenî, la reyna zî îdarekar û karmendî seba pawitişê karkeran ti gaman nêerzenî. Goreyê netîceyê qezayê ke serra 2016 de Êlih de bîyî, tewr kêmî 5 karkerê înşaatî qezayê karî de cuyê xo vînî kerdî û 20 kesî ra zêde karker zî birîdar bîyî.

Serra 2016 de herêma Organîze Sanayî ya Êlihî de înşaat de kendir qerefîyabî. Netîceyê qewimîyayîşî de yew karker binê vîncî de cuya xo vînî kerdbî û 20 karkerî zî birîndar bîbî. Reyna wesayîta ke karkeran berdêne keye rayîr de qeza kerdbî û yew karker merdbî û 15 karkerî zî birîndar bîbî. Qezaya Kercewsî ya Êlihî de 12ê kanûne 2016 de înşaat rijya karkeran ser de û 3 karkerî binê enkazî de mendbî û merdbî û yew zî birîndar bîbî. Heta ke îdarekarî seba pawitişê karkeran yew game nêerzî do rewşa karkeran wina dewam bikera.

**SEKTORÊ ÎNŞAATÎ**

Tirkîya de her ke şono mergê karkeran zêde beno, la Tirkîya de tewr zaf sektorê înşaatî de mergî benî. Înşaatanê berzan de seba pawitişê karkeran ti tedbîr nîno girewtiş û cuyê karkeran qet nîno hesibnayîş. Karkeran rê perwerdeyê pawitişî zî nîno dayîş. Hedefê karmendan tena qezenc û kar o. Karker bin şert û mercê tewr zehmetinan de mecbur manenê ke bixebetyî. Îdarekarî qet şertê karkeran nêvînenî û cayê karî yê karkeran nîno kontrolkerdiş.

**MERGAN MEŞRÛ KENÎ**

Karkerê ke înşaatî de xebetîyenî, zaf reyan cayanê berzan ra ginenî erd. Karkerî netîceyê ginayîşê erdî de ya mirenî ya zî seqet manenî. Wexto ke mergê karkeran beno, îdarekarî wazenî mergê karkeran meşrû bikerî. Karkerî bê kendir û bê pawitişê ganî xebetîyenî. *ÊLIH - DÎHABER*

www.arsivakurd.org

ROJEVA Medya
15 Çile Yekşem 2017

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına

İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
*Yenişehir-DİYARBAKIR*

*Tel:* 0 (412) 224 35 93
Baskı *(ÇAP):*
*İstanbul:* Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. *No:* 23/A
*Küçükçekmece İSTANBUL*
*Tel:* 0 (212) 580 63 81
*Adana:* Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık
Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
*No:*13/A *Yüreğir / ADANA*
*Tel:*0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
***e mail:***
rojevamedya@hotmail.com

# Çay û çaydankên navdar ên gerîlayan

**Gerîlayên ku her tim bi şer û têkoşîna xwe di nav gelê kurd de sembola azadî û rizgarbûnê ne, di heman demê de ji tunebûnê jiyanê diafirînin. Li çiyayên azad jî çaya çaydankên reş bi nav û deng e**


ROZA AMED / BEHDÎNAN - ANF

Çaydankên reş ên her tim li cem gerîla hene. Jixwe tim tê gotin, çaya gerîlayan gelekî cuda ye. Ya ku vê çayê bi tehm dike jî çaydankên reş ên gerîla ye.

Piştî rêwîteyeke dûr û dirêj, gerîla li dora agir li hev dicivin. Di vê demê de çaydankê reş dikeve dewrê, ji bo ku barê gerîla hinekî sivik bike. Şert û merc çi dibin bila bibin, çaydankê reş her tim bi gerîla re ye. Cihekî vî çaydankî bişikê yan jî bifelişe, dîsa tê sererastkirin û tevî hesret û îsyana gerîla, çay di vî çaydankî de dikele.

Tevî vê çaya bêhempa ya di çaydankên reş ên gerîla de, sohbeta gerîla ya li dora agir jî hêjayî guhdarîkirinê ye.





## Jin kargeha sewalan bi rê ve dibin

**Bi destpêkirina Şoreşa Rojava heta niha jin di hemû qadên jiyanê de cihê xwe digirin. Yek ji van qadan jî qada aboriyê ye. Niha jinên rojavayî bi xwe dest bi vekirina projeyên xwe yên taybet dikin. Yek ji van projeyan jî Navenda Xwedîkirina Sewalan a Dîcleyê ye ku li bajarê Dêrikê vebûye. Jinan bi vekirina vê kargehê ji bo jinan derfetên kar a'randin. Berpirsyar û karkerên vê kargehê hemû jin in. Yanî ji dotina sewalan bigire heta çêkirin û 'rotina berhemên ku ji şîr tên çêkirin, ji hemûyan jin berpirsyar in. Jinên ku li kargehê dixebitin anî ziman ku wan bi vekirina vê kargehê cihê xwe di nav qada aboriyê de girtiye û diyar kir ku ew bêyî ku muhtacî kesên din bibin, debara xwe bi destê xwe dikin.**
**Her wiha rêveberên projeyê destnîşan kir ku ji ber ku proje bi ser ketiye ew dê vê projeya xwe ber'rehtir bikin û beşa xwedîkirina mirîşkan vekin. Ji bilî vê yekê li kargehê 170 mih tên xwedîkirin.** DÊRIK - ANHA

# ‘Serê salê binê salê Xwedê azadiyê bide vê malê’

HULYA EMEÇ / SÊRT - ANF

Gelê kurd pêr bi şev sersala xwe bi hêvî û bendewariya “Serê salê binê salê, xwedê azadî û aştiyê bide vê axê” pîroz kir.

Sersal ji aliyê gelek gelan ve li gorî salnameya mîladî her sal di 1’ê çileyê de tê pîrozkirin. Lê gelên Mezopotamyayê, li gorî salnameya hicrî di şeva 13’ê çileyê de sersala xwe pîroz dikin. 13’ê çileyê, ji demên qedîn ve ji aliyê kurdan ve wek destpêka sala nû tê dîtin. Ev salnameya rojê ku bi hezar salan e ji aliyê kurdan ve tê pîrozkirin, digihîje gelên qedîm ên Mezopotamyayê sumerî û babîliyan.

Di vê sersalê de ku li ser xaka kurdan tê pîrozkirin, zarok kincên balkêş li xwe dikin, rûyê xwe boyax dikin û mal bi mal digerin. Xwediyên malan jî xwarin û diyariyan didin zarokan. Ev çand beriya niha li 4 parçeyên Kurdistanê dihat pîrozkirin. Lê ji ber dejenerekirina çandî, pîrozbahiyên sersalê îsal kêm bûn. Yek ji cihên ku serê salê lê hat pîrozkirin jî Hawêla Sêrtê bû. Zarok beriya niha bi gotina ‘Serê salê binê salê Xwedê kurekî bide vê malê’ li nav malan digeriyan, lê îsal ji zarokên 12 salî heta ciwanên 20 salî, bi vê çîvanokan li nava malan geriyan û got ‘Serê salê binê salê Xwedê azadî û aştiyê bide vê axê.’ Zarok û ciwanan bi vê çîvanokê hêvî û bendewariyên xwe yên ji bo aştî û azadiyê nîşan da.

Li Hawêlê di pîrozbahiyên îsal ên serê salê de mêran kincên jinan, jinan jî kincên mêran li xwe kirin û zarokên xwe kirin ‘kalikê sersalê’ ango ‘kose’ li ber dahol û zirneyê li nav malan geriyan. Ji bilî vê yekê jinan jî ji bo vê roja taybet xwarinên kurdewar çêkirin û li malbatên xizan ên li taxê belav kirin. Her wiha pîrozbahiyên sala nû heta derengiya şevê dewam kirin.









## Stres nexweşiyên dil zêde dike

**Mirovên zanyar ên amerîkî diyar kir ku stresa zêde rîskên nexweşiyên dil zêde dike.**
**Li gorî encamên lêkolînên ku di kovara Lancet de hatin weşandin dibe ku di mêjî de zêdebûna aktîvîteyên beşa amîgdalayê ku hestên wekî tirs û xofê bi rê ve dibe, herî kêm bi qasî tansiyon û cigareyê bi zirar be. Li gorî lêkolîna ku li ser 293 nexweşan hat kirin 4 sal mêjî, pişik û damarên xwînber ên kesên nexweş hatin şopandin. Di encama pêvajoya 4 salan de li ser 22 nexweşên ku aktîvîteyên wan ên amîgdalayê zêde ne, nexweşiyên damarên dil hatin dîtin.** AMED

www.arsivakurd.org